

welat

Di şeva DEP'ê de;
Şahiya biratiya
Kurd, Tirk, Laz
û Çerkezan



Rûpel 5

Sal:2 Hejmar:102 30 Rêbendan-5 Reşemî 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

DED dixwaze Welata geş vemiîne!

● Doza girtina Welat dest pê dike. ● Doz ji ber naveroka du nivîsarên hejmarê 73. hatiye vekirin. ● Doza Welat bala gelek derdorên siyasî kişande ser vê helwesta dewletê ya nû. ● Cara yekemîn e ku di îdianameyekê de behsa zimanê Kurdî tê kirin û der barê naveroka nivîseke Kurdî de qala sûcdariyê tê kirin. ● DED îdia dike ku nivîsên Welat ji hêla wergêrê sondxwarî ve hatine wergerandin. ● Doza Welat roja 31'ê Rêbendanê saet li 9.20'an dest pê dike. ● Zêdeyî 20 ebûqat wê beşdarî dozê bibin. ● Berpirsiyarê Nivîsaran Mazhar Günbat wê bi Kurdî parêziyê bike. ● Bi vê dozê DED'a Stenbolê Qanûnê Bingehîn a dewleta Tirk îhlal dike. ● Li Tirkîyeyê tevî ku saziyeke Kurdî ya fermî tune, dewletê wergêrê sondxwarî tayîn kiriye.

Rûpel 8



MUZÎKA KURDÎ
DÎROKA GELÊ
KURD A DEVKÎ YE

Ferec Kurêşivan

Rûpel 11

JI DÎROKA KÊMNETEW Û OLÊN KURDISTANÊ CIHÛ Û CIHÛTÎ

Ji kîjan demê ve cihû hatibûn Kurdistanê û kengî cihûtî li wir belav bûbû? Hinek dîrokzan guman dikin ku cihû yekemîn car piştî sala 722 berî zayîna Îsa (B.Z) hatibûn Kurdistanê.

Dr. Kemal Sîdo-Kurdaxî

Rûpel 12



'AVÊ DI SER
ME RE AVÊTIYE
AN BOSTEK
AN ÇAR TILÎ'

Roportaj:
Salih Günbat

Rûpel 16

EHMED DAWÛDE: MEYJENÊ NAVDAR Ê GELÊ ME

Kurê mezin ê Dawûde Newzat dibêje: "Rehmetî bavê min, di dema xwe de di gel stranbêjê nemir Alî Merdan, Ehmed Dawûde di gel mey lê xistibû. Mala wî Mamoste Tahîr Tewfîq, Hesên Zîrek, pîrr kesên kar kiribû."

Pismam

Rûpel 13

Welat geş dibe

Her tişt ji bo jiyaneke nuh!



Xwedî
Zübeyir Aydar

Berpirsiyarê Giştî
Abdullah Keskin

Berpirsiyarê Nivîsaran
Mazhar Günbat

Nivîskar

Musa Anter

Sara Akan

Evin Aydar

İsmail Beşikçi

Hatip Dicle

Mustafa Demir

Hüseyin Deniz

A. Dîkîlî

Dilbixwîn

Aysel Doğan

Abdurahman Durre

İsmail Göldaş

Talat İnanç

Yaşar Kaya

Amed Tigrîs

Faqe Huseyn

Leyla Zana



Navnişan
Başmusahip Sok.
Talas Han No: 16
Kat: 3. No: 301
Cağaloğlu / İstanbul

Tel-Fax: 512 12 87



Rojnameya
Hefteyî

welat

22'ê Sibatê
derket

her cumartesi
bayilerde

Tîka ye me dilsar nekin

Nivîskar û xebatkarên rojnâmeya Welat, merheba ji we re. Hevalino, min divê li ser navê mehan ku we bi Kurdî di hejmara 95'an de weşandibû, fikra xwe bibêjim. Beriya du salan, navê meh û rojên bi Kurdî li ser salnameya (teqwîma) rojnâmeya Yenî Ûlkeyê hatibû nivisandin. Wê gavê em gelek pê şanaz bûn, me da destê xwe û em li serê sekinîn. Pêşî me xwe hîn kir û bi dû re zar û zêçê xwe û hevalên der û dora xwe jî hîn kirin. Wê çaxê navê mehan bi vî awayî hatibû rêzkirin:

Çile, Sibat, Adar, Nîsan, Gulan, Hezîran, Tîrmeh, Tebax, Îlon, Cotmeh, Mijdar û Kanûn.

Ji wan mehan re jî me wateyek dida wan. Çile, meha zehmetkeşiyê; Sibat, meha sebrê; Adar, meha adanê ango dew kuldanê; Nîsan, me wateyek jê re nedîtibû; Gulan, meha ku gul sor vedibin. Hezîran, meha ku hirmiyê hezîranî tê de digihîjin; Tîrmeh, meha ku tirî dibelitin ango digihîjin; Tebax, meha

germiyê; Îlon, belku maneya wê ne rast be jî, meha ku êl warên xwe tê de diguherin; Cotmeh, meha xubariyan, ango ya ku cotyar wê salê nû dest bi cot dikin; Mijdar, meha ku dar û ber tîn mehtin, pelê xwe diweşînin û ziwa dibin; Kanûn, ji meha agirê kanûnê ango bixerî, tifikê re me mane didayê.

Bi dû re di "Bexçeyê Zarokan" de Gabar Çiyan û Zêd Yildirim bi teşeke din navê mehan weşandin. Wan jî wiha rêz kiribûn: **Adar, Nîsan, Gulan, Hezîran, Tîrmeh, Tebax, Êlon, Kewçêr, Çiriya Berî, Çiriya Paşî, Çileyê Berê, Çileyê Paşî.**

Weke ku tê bîra min, keçeke 16 salî bi navê Safiyê Akdağ li wan rexne kir. Wan jî ev cewap dabû me ku ev nav ji kovara Hawarê derxistine û wek dewlemendiya zimanê Kurdî dabûn nîşan.

Niha jî di hejmara 95'an de di rûpela 11'an ya rojnâmeya Welat de bi awayekî din hatiye weşandin. Ev jî wiha ye: **Adar, Avrêl, Gu-**

lan, Pûşper, Tîrmeh, Gelawêj, Rezber, Kewçêr, Sermawez, Berfanbar, Rêbendan, Reşemî.

Hûn jî baş dizanin ku gelê Kurd bi zimanê xwe weke tûtîyê gernas û hewayî jî bi zimanê xwe nizane biaxive. Wek ku mamoste Amed Tigrîs jî di rûpela 15'an "Tûtî û Kurd" de nivisandiyê eyne rast e. Hê Kurd bi zimanê xwe weke tûtîyê jî nizanin.

Ez jî wiha difikirim hê ku em tiştê hîn nebûne, eynî tişt bi awayekî din derdikeve. Ma ku ev baş bêne guftûgokirin û baş zelal bibin, hêja bêne weşandin baştir nabe?

Tîka min ji we heye, tiştê wiha û yên weke wan baş guftûgo bikin, zelal bikin, bi dû re derxin holê. Ji ber ku tevî hev nebin, gel jî perwerdehiya zimanê xwe sar nebe.

Di dawîya wan tevan de ez silav û hurmeta xwe ji we re diyar dikim û di sala nû de serketin û serfiraziya we dixwazim.

Xalê Elo

Serbazekî bi namûs

Despêka nivîsa xwe bi daxwaziya silava Yezdan li ser karkerên rojnâmeyê tînim.

Bi ditîna min, kêmasiya gelê min ya herî mezin, nezaniyêna dîrokê ye. Bi vî awayî, dixwazim gelê min, pêşî bi demên welat ên derbasbûyî bê hesandin. Zanîna min, li ser dîroka me nîn e. Ji ber vê yekê ez xwe mîna mirovek ku di şeveke tarî de bêronahî dimeşe, dibînim. Bi bawerî me û bawer dikim ku dîrok ji pêşiya mirovan re ronahî ye.

Niha dixwazim bûyereke ku çend sal berê li min pirr tesîr kiriye, binivîsim.

Zarok bûm, hema tê bîra min û ezê tu car û tu car jî bir nekim. Gundê me di Eyaleta Xerzan de ye. Petrola ku di rafineriya bajarê Batmanê de tê bikaranîn tev ji xaka gundê min diçe. Hingê gerîla karkerên birên petrola gundê me girtin û berdan û ji wan re gotibûn hûn nexebitin, ew jî naxebitin. Rafineriya Batmanê bêkar ma ye, sekiniye.

Wan salên ku hêj Artêşa Rizgariya Gel bi kar û ava nebûbû, her sal sê çar birên petrolê vedikirin. Dîsa salekê dema hatin derxistina petrolê, şantiyek linêzî gundê

me avakiribûn. Şevêkê karkeran bi damançeyê lîstibûn û li wan ketibû û birîndar bûbûn. Wan jî, ji bo veşartina qebaheta xwe ji amîrên xwe re gotibûn hinekan îşev li me dan. Êdî serê sibehê serbazekî Farqînê bi tevî leşkerên xwe ve hate gundê me, gundî civandin, bi rêz kirin û got: "Kê li karkeran xistiye bila bibêje." Gundiyê reben jî jî vê bûyerê bêxeber bûn. Gotin: "Em nizanin." Wî serbazî teştek ava şor da amadekirin. Heb û heb piyên gundiyan xistin qayîşên tivîngan û êdî li binê piyên wan dan. Xeber ji serbazê qerqoleke nêzî gundê me re şandin. Ev hat rewş dît û pirr xemgîn bû. Hêj nû bûbû "asubay" û pêşî anîbûn qereqola ku, gundê me li ser e. Çû ber devê wî serbazî û got: "Ev ne qanûnî ye. Misade nadim tu di hudûdê welayeta min de vê bêqanûniyê bikî." Serbazê din pê re hinek qerîna bi zimên kir. Dû re ew serbaz çû serê xaniyekî û bi bêtela xwe bi Farqînê re axivî. Hat xwarê û gundî civandin û ew birin wî aliyê çem. Êdî li wir wisa li wan da ku dengê qerîna wan dihat gund. Jin, zarok, dapirên

hêsr tev bi hev re ji wan re digîriyan.

Serbazê qereqola me li wir jî li hember wî serbazî derket, li wî qerîn kirin. Û ew kelogirî hat û çû qereqola xwe. Paşê gundî berdan, çûn qereqolê. Lê serbaz rast çûbû bajêr. Gundî û gundiyan der û dor li erebeyan siwar bûn û ew jî çûn bajêr.

Di rê de gundî û serbaz li hev derbas bûn. Texsiya ku serbaz tê de bû sekinî û diqerîya ji gundiyan re digot: "Ez çûm bajêr, lê civakiyek hebû. Min kes nedît ta werin em bi hev re herin. Kesî nasnakim. Hûn bibin alîkar ku em li mafê xwe bipirsîn. Bi hev re çûn bajêr û karê xwe hel kirin."

Belê bûyer ji vî awayî xerabtir bû. Lê baş nayê bîra min ku bibêjim. Wî serbazê Farqînê pirr çêr dikirin. Lê carekê wiha çêr kir. "Min di çavê wî Atatürkî kiro, pêşî serên hemû Kurdan nebîrî, îro li serê me bûne bela."

Belê! Ew mirovên Kurd ku heqîqeten ne heywan be, wê weke wî serbazê me bibe û li mafê xwe bipirse.

Bimînin di xweşaliyê de.

Mîrhem Rehberda

Nivîsara Welat

Aboneyên me zêde dibin

Pirsgirêka me ya belavkirinê didome. Ev sê hefte hene ku di nav sînorên derfetên xwe de em rojnâmeyê bi destê xebatkarên xwe yên navendê û bi navgîna çend belavkarên Welat ên taybetî belav dikin. Her çendî derfetên me bi sînor bin jî, em Welat digihîjin gelek deveran.

Li hemû bajarên Tirkiyeyê bi navgîna belavkarên Welat û saziyên welatparêz ên wek DEP'ê û bayiyên Kurd, wê Welat bê belavkirin. Ger xwendevanên me yên li derveyê Stenbolê di ber xwe re bayiyên welatparêz tesbît bikin û navnîşanên wan ji me re bişînin wê Welat ber xwe hefte bi hefte firehtir bike.

Mixabin, li Kurdistanê ev pirsgirêk pirr mezin e. Hezên dewletê nahêlin Welat bikeve Kurdistanê, ku

Li hemû bajarên Tirkiyeyê bi navgîna belavkarên Welat û saziyên welatparêz ên wek DEP'ê û bayiyên Kurd, wê Welat bê belavkirin. Ger xwendevanên me yên li derveyê Stenbolê di ber xwe re bayiyên welatparêz tesbît bikin û navnîşanên wan ji me re bişînin wê Welat berê xwe hefte bi hefte firehtir bike. Mixabin, li Kurdistanê ev pirsgirêk pirr mezin e. Hezên dewletê nahêlin Welat bikeve Kurdistanê, ku dikevê jî belavkarên wê tehdît dikin an jî dixin bin çav.

Bes bi awayekî emê çareyeke jê re bibînin.

Esas, berê jî me anîbû zimên ku ya baş ew e ku bi navgîna abonebûnê ev pirsgirêk jî holê rabe, bi sîstema abonetiyê, bi rêk û pêk Welat dikare bikeve destê xwendevanên me. Ev du hefteye

hejmara aboneyên me zêde dibin û pêwîst e hîn zêdetir jî bibe.

NÛNERIYA WELAT A EWRÛPAYÊ

Weke tê zanîn heta vêga nûneriya Welat a Ewrûpayê li Bonnê bû. Ji hefteya din ve hevalên me yên Stockholmê ev wezîfe girtin ser xwe. Nûneriya Welat a Ewropa bi berpirsiyariya Amed Tigrîs ve wê bido me. Abone û xwendevanên me yê li Ewrûpayê ji kerema xwe re bila ji vêga pê ve Stockholme wek muhatap bipejirînin û pirsgirêkên xwe yên der barê Welat de ji nûneriya Ewrûpayê re pêşkêş bikin. Di rûpela me ya 16 de tel (fax) û navnîşana nûneriyê tê diyarkirin.

DERSÊN KURDÎ

Ji gelek deveran, xwendevanên me an jî welatparêzên ku baş bi Kurdî nizanin, dixwazin ku Welat dersên Kurdî pêşkêş bike. Di rûpela me yê 6'an de vê hefteyê hevalê me dîtina hin eleqederan standiyê û pêşniyarên wan pêşkêş dike. Emê li ser wê yekê jî bisekinin û ger derfeteke welê hebê emê nêrîna Welat jî di hefteyên pêşiya me de pêşkêşî xwendevanan bikin.

Wekî din, ji gelek xwendevanên xwe em pêşniyarên kampanyayekê peyivîna bi zimanê Kurdî distînin. Giş dibêjin bila îsal wek saleke zimanê Kurdî bê îlankirin û Kurd li hemû deveran bi Kurdî bixwînin û jî hev re bi Kurdî binivîsin. Emê li ser vê pêşniyarê jî bi girîngî bisekinin û bi ihtimaleke mezin kampanyeyekê welê bidin destpêkirin, bi navgîna Welat.

.....NÛÇEYÊN CENGÊ.....

Terora li welatê 'çi me jê'

Navenda Nûçeyan- 19 Rêbendan 1994- Di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên leşkerî de li Elbîstanê û navenda Qoserê (Kiziltepe) şer derket. Li Qoserê gerîlayek û li Elbîstanê gerîla Halîl Şahîn û Fatma Bestan mirin.

120 kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin. Li Wanê 100 kes, endamên DEP û SHP'ê û xwendekarên dibistanan û li Giyadînê (Diyadîn), li gundên Elkê (Beytüşşebap) Çeman û gundên Nihya Hekarî Peyanîs (Geçitli) 20 kes hatine binçavkirin.

Li gundê Nisêbînê Sirêçkê, hêzên leşkerî 60 xanî şewitandin. Li gorî gotina gundiyan leşkeran hefteyek wext dane wan ji bo ku gund vala bikin.

Muxtarê gundê Têkor (Dîgor) Dolayli, ji aliyê 6 kesên nenas ve hate kuştin û dû re ji dibistana gund şewitandin.

20 Rêbendan 1994- Li gundê Qubînê (Beşîrî) Arenze (Beşpînar) û li gundê Îdir Muştalî di navbera gerîla û leşkeran de şer derket, 3 leşker û 2 gerîla mirin, 19 leşker ji birîndar bûn.

Piştî êrişê gerîla hêzên leşkerî, gundê Arenze dan ber gulleyan, Muhtullah Kaya û yekî koçer, di vê gullebarankirinê de mirin. Li gundê Muştalî ji 2 gundî daxwaza leşkeran ya ku gundî cerdevaniyê bipejîrinin, bû.

Leşkeran, 5 malên gundê Xirabsorka Miksê (Bahçesaray) şewitandin.

30 gundên Hamûrê (Ağırî) di bin tehdîda hêzên leşkerî de ne. Ji ber ku hêzên leşkerî dixwazin ew bibin cerdevan. Bi ber vê zorê ji qismek gundan, ji mecbûrî cerdevanî qebûl kirine.

21 Rêbendan 1994- 500 Cizîrî, di binçav de ne. Hêzên dewletê (leşker, polis û cerdevan) li Cizîrê (zarok û mêr) 500 kes, ku temenê (emrê) wan ji 10 heta 50'yê de xistin bin çav.

Li Amedê, Êlihê û Nisêbînê kesên nenas, 2 kes kuştin û 5 kes ji birîndar bûn. Di van êrişan de Giyasetîn Uğur (Êlih) û Abdülhakî Türk (Nisêbîn) mirin.

Wesiteya leşkerî li Amedê ji aliyê gerîlayan ve hate gullebarankirin, 16 leşker birîndar bûn. Li gundê navçeya Karakoyunlu (Îdir) Yukarî Alicanlarê, di navbera gerîla û leşkeran de şer derket, 2 leşker û 2 gerîla mirin. Ji van gerîlayan navê yekî Mecît Koç bû.

Hêzên leşkerî, gundiyan Muştalî (Îdir) bin çav kirin û trektorek şewitandin. Li gundê Qoserê (Kiziltepe) Hêşeriyê ji hêzên leşkerî, mala Hamît Akkoyun (lawê wî gerîla ye) şewitandin.

Giyadîn û Bazîda Ağırî, ji aliyê leşkeran ve hate gullebarankirin. Di gullebarankirinê de zêdeyî 100 cihên kar (dikan) xesar dîtin û du bira ji (yek jê di işkenceyê de destê wî şikestiyê) hatine binçavkirin. Gullebaran-

■ Di zivistana reş de terora reş, çar hawîrê Kurdistanê xistine bin bandora xwe. Li Cizîrê êdî tax bi temamî tên binçavkirin. Navê taxa Cûdî dibe Cumhuriyet. Ji deh saliyan heta 70 saliyan zarok û mêr tene binçavkirin. Gelo ev yek ji me re pirr xerîb e, ne doh Sedam 8 hezar xort (10 salî) û mêr birin cihekî ku heta vê gavê winda ne. Îcar, Kurd ne bêhayê van tiştan in. Heta demeke nêzik, kesên ku li bajaran bi cih bûbûn, bi vê kirinê, xwe ji zilmê rizgarkirî dihesibandin, ji ber ku gundî di bin potînen leşkeriyê de bûn û zehmetiyeke ewqas mezin li bajaran nedidîtin. Lê niha êdî bajar ji ne stargeh in û reva metropolan jî. Dewletê, welatê Kurdan kiriye "Welatê çi me jê", pêwîst e wezîfeya Kurdan jî, guherandina vê nerastiye be.

kirina leşkeran bû sebêbê mirina 2 leşkeran jî, ji ber ku bi guleyan tîlên elektrîkê qetiyên û 2 leşker, ji ber ceryangirtinê mirine.

22 Rêbendan 1994- Gerîlayên ARGK'ê girtin ser gundê Stewrê Akyürek, 20 kes mirin 8 kes jî birîndar bûn. Şer, di nav gerîla û cerdevanan de derket û di vê êrişê de 11 cerdevan û 4 jî lêzîmên cerdevanan, tevî 20 kes hatin kuştin.

Li gorî Kurd-A'yê gerîlayan li Şimexê 9 leşkerên "Artêşa Taybetî" dil girtine.

175 kes, li gundê Melazgir, li Cizîrê û li gundê Îdirê hatine binçavkirin. 46 kes jî li gundê Dihê (Eruh), li Tûxê (Tatwan) û li Ağırî û Îdirê hatin tewqîfkirin.

Li Ruhayê 5 muxtarên ku, ji bo civîna leşkeran civiyabûn û li dû civînê hatine binçavkirin.

Kesên nenas, li Amedê bi navê Mehmet Çelenk kesek kuştin. Ev bûyer ne diyar e ku ji aliyê kê ve hatiyê kirin.

Serbazê leşkerî yê Qereqola Bekîrhan (Hezo-Kozluk) Cengîz İlhan, muxtarê 30 gundî tehdîd kirin û ji bo cerdevaniyê heta 3'yê Reşemiyê muhlet daye.

23 Rêbendan 1994- Gerîlayên ARGK'ê girtin ser tabûr û gundên cerdevanan, 17 leşker, 2 cerdevan û 2 gerîla mirin.

Bi êrişê gerîla re, 15 leşker di Tabûra Ziyareta Serê (Summak-tepe) ya Qilaban (Uludere) û 2 leşker, 2 cerdevan û 2 gerîla jî, di êrişê gerîla ya li ser gundê Sêrtê bi navê Tîrê (îkizce) de mirin.

Li Cizîrê bi êrişê gerîla, polisê mir û 10 polis jî birîndar bûn. Êriş, ji aliyê gerîlayan ve çû ser muduriyeta emniyetê û piştî êrişê, hêzên dewletê raste rast gulle barandin ser bajêr, 7 kes birîndar bûn, nêzikî 150 dikan û cihên kar xera bûn.

Cerdevanên gundê Dêrikê Şêxhabîb, bi zorê keçikek ji Wêranşar revandin.

Hêzên dewletê, li Bismilê gelek kes bin çav kirin. Ên ku hatine binçavkirin qismek hatin berdan û gelek jê ji xwendekarên dibistanê ne.

36 gundê Qaqizmanê, ji aliyê hêzên leşkerî ve tê tehdîdkirin, da ku ew bibin cerdevan.

24 Rêbendan 1994- Gerîlayên ARGK'ê, bombe xistin bin boriya petrolê ya BOTAS'ê, 500 milyar xesar çebû. Li navbera Cizîr û Hezexê nêzikî 5 kilometre borî tevî petrola tê de, sewitî.

Li gundê Hezexê Kartnînê (Eyvantepe) gerîla, minîbusek cerdevanan da ber gulleyan, cerdevanek û 2 kes mirin, 7 kes jî birîndar bûn.

Li Amedê, wesiteyeke polîsan li zarokê ji Taxa Seyrantepeyê qelibî (Ahmet Efe-8), lêwik di cih de can da.

Qeymeqamê navçeya Meletê Argûvanê Ahmet Altıparmak, gundiyan gundê Narmîkan, bi gund şewitandinê tehdîd kir, heke ku ew rayê xwe bidin DEP'ê, Serokê Belediya navçeya Îdir Karakoyunlu, ji aliyê kesên nenas ve hate revandin.

25 Rêbendan 1994- Li Amedê di binaya Walîtiyê de bombe teqiya, keçikek 5 salî mir. Ev bûyer ji aliyê ERNK'ê ya bajêr ve hate kirin û wan ji gel xwest ku ji sazîyên dagirkeran dûr bikevin ji bo ku zirarê nebînin.

Qehwexaneyek li Farqînê ji aliyê hin kesan ve hate gullebarankirin, 2 kes mirin 3 kes jî birîndar bûn. Kesên ku hatine kuştin ev in: Sitkî Fidan û Hüs-nü Türk.

Kesên nenas, li Nisêbînê êrişek birin ser Fuat Tunç, di êrişê de Fuat Tunç mir.

Li Amedê û Meletê 7 kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin, ji hêla din ve hêzên leşkerî, ji gundê Hazroyê bi navê Heyderekan (Budaklıdere) 8 gundî binçav kirin.

Gundê mebûsê DEP'ê Zübeyîr Aydar Dêrawît, dîsa ji aliyê tîmên artêşa taybetî ve hate şewitandin. Di sergirtina gund de 60 mal hatin şewitandin.

Hêzên leşkerî gundiyan gundên Kercewsê (Berçû) Xirbêta û Êrmûnî tehdîd kirin, da ku ew bibin cerdevan.

Belavkarê rojnameya Özgür Gündemê bajarê Wanê İsmail E-rors, dema di bin çav de bû, ji aliyê polîsan ve bi cop hate tecawuzkirin.

HAWAR

Dilbixwîn

Jan Dost
û silavek ji bo welêt

Destpêka her nivîskarekî helbestek e. Gelekî kêmin ew nivîskarên ku helbest nenivîstandine. Helbestnivîsandin êşekê diwar e. Hestek e, giyanek e wisa ye ku her kes nikare di nava hinavên xwe de hilgire. Ereb ji hozanvanan re dibêjin "şair" ango kesê ku hesta wî xurt be û bi êşan bihese. Gelo, her mirovekî helbestan dinivîsîne, hozanvan e? Bêguman na! Lewre du cureyên nivîsandina helbestan hene. Helbesta çêkirî û helbesta xwe dinivîsîne. Li vir ez dixwazim biranîneke bi Jan Dost re bînim ziman.

Jan Dost, hozanvanekî ciwan e. Em ji nêzik ve hev nas dikin. Gelek biranên me bi hev re hene. Me di gel hev di birêvebirina kovareke wêjeyî de cih girtiye. Helbesta xwe ya nû ji min re dixwend, min jî helbesta xwe ya nû ji wî re dixwend. Em li ser kêmasî û şaşîyan diaxivîn. Ev pênc sal in ku me hev nedîtiye. Berî vê bi çend rojan ew bi mêtandî hatibû Stenbolê, li navenda rojnameya Welat bû. Telefonê em bi hev ve girêdan û dengê me gihande hev.

Di helbestên Jan de jan hebû. Bi kenê wî re girî hebû û tu caran navên cih, kes û tiştan ji helbestên wî qut nedibûn. Mirovê guhdar neçar dibû ku bi helbestên wî re bigere û hem li şînan, hem jî li şahîyan rast were. Bêguman min wê di dawîya her helbesteke wî de kesereke kûr û bi kovan bikişanda.

Di helbestên Jan de jan hebû. Bi kenê wî re girî hebû û tu caran navên cih, kes û tiştan ji helbestên wî qut nedibûn. Mirovê guhdar neçar dibû ku bi helbestên wî re bigere û hem li şînan, hem jî li şahîyan rast were. Bêguman min wê di dawîya her helbesteke wî de kesereke kûr û bi kovan bikişanda.

Belê, di telefonê de em li ser gelek pirsan rawestiyan. Lê, ne mimkûn bû, her tişt bihata ziman. Hizîngeke tûj kaş kir û got: "Xwezî em li cem hev bûna, wê me gelek gotin bigotana. Di dilê min de pirr tişt hene. Min dixwest careke din dilê me ji hev re vebû û hinekî em li salên derbasbûyî vegeyriyana..."

Jan; bêhna min teng kir. Çavên min weke kehniyan ron-dikên germ barandin. Ji min pirsî û got:

- Çi hate serê helbestên te?
- Helbestên çi?!
- Ew helbestên ku te ji min re dixwendin. Gelekî ciwan, bedew bûn. Hîna jî, ji bîra min neçûne.
- Tu çima wan nawêşîni?
- Biborîne Jan, êdî pirranî nivîsên "Hawar"ê ez di trêne de dinivîsînim. Dil bersiva her pirsê nade.

Dixwaze, lê hema bi daxwaza dil hemû pirs çareser na-bin.

Helbestên min veşartîne. "Helbestvanan" rê li pêşîya helbestan girtine. Gelo, nayê bîra te dema te digot du rêngên helbestan hene; yek helbesta ku pênuş wê ji ber xwe di-avêje, ya din jî helbesta ku tu hêz nikarin piştê wê bitewînin. Ji xwe re li meydanê bimeyziyê, kesên nikarin gotina nêr û mê ji hev cuda bikin, bûne helbestvan.

- Guneh e, cih li wan helbestên xwe teng neke. Jan, ez gelekî eşandim. Min nedixwest ez helbestan veşêrim, lewre her yek ji wan êşeke giran e, ji nava keleke germ derketiye. Mirov nikare cesaret bike, hestên ciwaniyê bikuje?

Berî ku em xatîrê dawiyê ji hev bixwazin, min ev jê re got:

- Her kes weke te nafikire. Binivîsîne, ezê bi dilgermaya berê wan helbestên te bixwînim. Tu Hawara min ji bîr nekî, hem bixwîni, hem jî bidî xwendin. Silav bike, careke din ji ber min ve destê her welatparêzekî biguvişê. Bi xêr li welat vegeerî.

Berî her kesî diya J.Dost helbesta wî dinirxand. Weke rexnegirekê li helbestê dimey-zand. Jan; rex-ne û pêşniyarên wê ji xwe re di-kirin bingehên pêşketinê. Kurê malbateke tore-perwer û huner-hez e.

Gotûbêjên me yên berî pênc salan li ser naverok û forma helbestan bûn.

Serokê Israyîl bo yekemîn car deçête Turkiye...

Nûçeyên Derve- Rojî 24. 1. 1994 Serokê Israyîlî Azir Wayîzmin be serdanêkî resmî ke çîwar roj dexayenê geştiye Turkiye, em carî yekem e ke serokê Israyîlî biçête Turkiye. Dîplomasiyêkî Turkî le wesfî em serdaneda wîfî eme "seretay demêkî wê" ye bo dû dewletî gewrey nawçeke. Diwa nîweroy hema roj Sûleyman Demîrel pêşwazî le Serokê Israyîlî kird, her weha çawî be Tansu Çiller û cêgrekey kewt. Wa çawerwan dekrê ke meseley aşitî le rojhelatî nawerast da û hawkarî kirdin le hemû bawarekanda cêgey serekî bigrin le gift û gokanda. Waş debînrêt ke serokê Israyîlî serdanî berbestî Ataturkîş bikat. Le çawpêkewtinêkî rojname nusîda serokê Israyîlî raygeyand ke ayndey rojhelatî nawerast leser hawkarî berfire û le hemû biwarekanda le nêwan Turkiye u Israyîl û Mîsir westawe. Eme serdaneş le layen Wezîrî derewey Turkiye we amade kirawe ke pêştir serdanî Israyîlî kirdibu. Serçawekan delên ke danîştinkan zor başî cora û cor degrinewe le pêşewey her şitêkîş da meseley aşitî le rojhelatî nawerastda û berew pêşewebirdinî peywendî aborî û bazirganî le nêwan herdu lada. Pley alugor kirdinî Bazirganî le nêwan her dûla da le 55 milyon dolarî pêş şeş sal ewe geştiye 187 milyon dolar le salî 1992 da. Waş biryare ke serokê Israyîlî paşan be yawerî wefde hawrêkey ke le 20 xawen karî gewre pêkhatiwe berew Istanbul biçê bo çawpêkewtinî Niwênerî êlî Yehudiyan le Turkiye, bemeş debête diwem serokê Israyîlî çawî bem êle dekewêt ke jimareyan 25 hezar kes debêt.

Rojnamey Al-Şerq-Al-ewset

ÎRA livbaziye xwe xurt dike

■ Piştî lihevkerina Îsraîl û Filîstîniyan û pêkhatina Peymana Aştiyê li Afrîkaya Başûr, bi hewldanên Serokê Partiya Karkêran a Sosyal Demokrat John Hume û Serokê Sinn Fêin'ê Gerry Adams rê li ber lihevkerina ÎRA û Îngîltereyê jî vebû. Lê Serok Wezîrê Îngîltereyê John Major ji ber ku naxwaze gelê Îrlandayê yê li bakur mafê çarenûsiya xwe pêk bîne, rê li ber aştiyê digire.

Nûçeyên Derve- Arteşa komarî ya Îrlandayê li piştî nameya John Major ya ji Serokê Sinn Fêin'ê Gerry Adams re, ku roja 21'ê Rêbendanê hate şandin, dest bi livbaziye nû kir.

Wek tê zanîn roja 15'ê Berfanbarê di navbera Komara Îrlandayê û Brîtanîya Mezîna de lihevkerinek pêk hatibû û li dû wê lihevkerinê daxuyaniyek li ser mercên aştiyê hatibû belavkirin. Di wê daxuyaniyê de, tê gotin ku Îngîltere, mafê çarenûsiyê yê Îrlandayê dinase, lê wê yekê bi daxwaza pirraniya niştetichan ve girê dide. Dîsa dide xuyan ku, wê masaya guftogoyê ava bibe û Partiya Sinn Fêin'ê jî heke ÎRA dev ji şerê çekdarî berde, dikare beşdarî civînan bibe.

Serokê Sinn Fêin'ê Gerry Adams ji John Major xwestibû ku wê daxuyanê (mercên pêk hatina aştiyê dihindirîne) zelal bike, ka wê mafê çarenûsiyê çawa

pêk were.

Lê Major ev daxwaz red kir û daxuyand ku, di deklarasyonê de her tişt zelal e, bi wê yekê re jî rê li ber pêk hatina aştiyê û beşdarbûna Sinn Fêin'ê girt.

Li bakurê Îrlandayê pirranî di destê hevkarê dagirkerên Îngîlîz yê protestan de ye, ev jî tu car naxwazin ji Brîtanîyayê veqetin û gelê wan jî Îngîltereyê koç kirine hatine wê giravê, ev kes li dijî gelê Îrlandayê yê



Serokwezîrê Îngîlîstanê John Major



Serokê Sinn Fêinê Garry Adams

azadixwaz livbaziye tero-rist pêk tînin, pirranî livbaziye wan li dijî mirovên sivîl in. Hêzên dagirker jî alîkariya wan dikin.

Major li aliyekê qala mafê çarenûsiyê dike li aliyê din pêk hatinê wê yekê bi daxwaza van kesan ve girê dide.

ÎRA'yê jî piştî nameya

John Major, roja 23'yê Rêbendanê livbaziyeke nû pêk anî. Endamên ÎRA'yê li Belfast'ê bi roketavêjan êriş bir ser polisên ku li dewriye digerin. Li gorî jêderên fermî tu mirin û birindarî çenebûn. Tundxwazên Loyalist jî bombe avêtin du dikanên katolîkan, li wir jî tişt bi tu kesî nehat.



NASNAMEYA ÎRA

Artêşa Komarî ya Îrlandayê, di sala 1919'î de ji bo ku dagirkerên Îngîlîz ji welatê xwe der bike ji aliyê welatparêzên Îrlandayê ve hate avakirin. Li dijî peymanê Anglo-Îrlandayê ya 1921'an rabû. Bi wê peymanê 6 kanton (herêm) li Bakur ketin bin hikmê Brîtanîyaya Mezîna. Di serhildana 1929'an de li hemberî hikûmeta Îrlandayê tîk çû, li ser wê yekê heta 1960'an bêdeng ma. Di 1969'an de ji hev ketiyabû du şaxan; ÎRA'ya Fermî (resmî) û ÎRA'ya Herêmî. ÎRA'ya Fermî heta 1972'yan bêdeng ma, tenê ji bo yekîtiya Îrlandayê xebata siyasî kir. ÎRA bi pirranî, li dijî hedefên dagirkerên Îngîlîz û hevalbendên wan livbaziye wek suîkast û bombe kirin pêk tîne. Xebatên xwe yê siyasî bi destê Sinn Fêin'ê dimeşîne, di nav bakurê Îrlandayê jî sedî 11 ên katolîkan alîgirê Sinn Fêin'ê ne. Şerê ÎRA'yê êdî hatiyê qonaxa gihîştina encamê.

Di 1993'yan de

56 rojnameger hatin kuştin

Nûçeyên Derve- Li gorî daxuyaneke Komîteya Parastina Rojnamegeran di 1993'yan de li dinyayê 56 rojnameger hatine kuştin. Ev daxuyanî ji aliyê Rêveberê Komîteyê Wîliam Orme ve, roja 23'yê Rêbendanê hate weşandin. Ev hejmar ji sala 1991'an kêmîr, lê ji hejmara 1992 zêdetir bû, 1991'an de 61 û 1992'yan de jî 49 rojnameger hatine kuştin.

Li gorî wê daxuyanê, hejmara rojnamegerên ku hatine kuştin, li welatan wiha belav dibe: Cezayir bi 9 rojnamegeran di rêza yekemîn de ye, li dû wê bi 8 rojnamegeran Rusya tê, di rêza sêyemîn de bi 5 kesan Somali heye. Tirkiye bi 4 rojnamegeran di gel Kolombiya û Tacîkîstanê di rêza Çaremîn de ye. Ev liste wiha didome, li Angolayê, Gurcîstanê 3 rojnamegeran, li Hindîstanê 2, li Kongo, Horduras, Lubnan, Lîtvanya, Perû, Filipîn, DYA, Afrîkaya Başûr jî rojnamegeran hatiyê kuştin. Lê demekê berî wê Federasyona Navneteweyî ya Rojnamegeran ev hejmar wek 75 kes dabû nişan.

Peywendî

nêwan Tunis û Tel-Ebîb

Lêpirsrawêkî le berzî Tunîsî ewey dupat kirdewe ke Tunis hiç hengawêkî nenawe berew çabunewey peywendî le gel Israîl da tenha le çîwarçewey komelî erebîda nebêt. Lem diwayede qise leser çabunewey peywendî nêwan herdula be germî hebu ewîş be hoy çend serdanêkî lêpirsrawanî Israîliyewe bo paytextî Tunîs ke le nawyanda Yusî Bîlînî Cêgirî Wezîrî Derwe û Binyamîn Bîn Alyazîrî Wezîrî Niştetêkîrdin û Nesîm Zîfîlî Sekreterî Giştî Partî Kar, hebun. Her weha serçawekanî Tunîs ew hewaleyan ret kirdewe ke serokî Tunîs Zeynel Abdîn Bîn Alî çawî be Bizfîlî Kewtibêt. We zanrawîşe ke Bizfîlî le esil da yehudiyew le kotayî mangî befranbar da serdanî Tunîsî kirdwe û çawî be Yasîr Erefat û çend kesêkî tîrî Felestînî kewtwe.

Rojnamey Al-Serq-Al-ewset

OGNÎ

KÛLTÛR DERGÊHÎ
TIRKÎ SADE 2
Peyvê 20.000 TL.
OGAR 1994

- MEGREL — LAZLAR DOSYASI
- OXORZALEPE ŞENÎ
- MİLLÎ MÛCADELEDE LAZLAR
- NUH TUFANI VE NUH'UN
- EVLATLARI
- "LAZ" SÖZCÛĞÜNÜN KÖKENİ

Hejmara Ognî ya nû derket

Hejmara duyemîn a kovara Ognî ya du mehî, derket. Ev kovar ji aliyê Lazên Tirkiyeyê ve derdçe. Hejmara yekemîn ji aliyê Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê ve hatibû berhevkerin. Di hejmara Ognî ya duyemîn de derbarê gelek pirsgrîkên siyasî û çandî de nivîs hene. Ev kovar bi zimanê Tirkî û Lazkî tê weşandin. Di kovarê de di quncikê Şiroveyê de bi navê "Rihê AGİK'ê û rewşa ku tê afirandin "nirxandinek heye. Di kovarê de, Ahmet Hacaoğlu bi navê" Ji bo herkesî saleke dijar, zewacên mecbûrî nabeşin," Yahbab Yokalozi "Ji nû ve zayîna Kolkhîde yê", di quncikê "bênirxandin" de nivîsek bi navê "Hubra Zuhanebûyî" û di quncikê "Olandan yankîlar" de Prof. Dr. Yılmaz Atıg nivîsek bi navê "Komara Abhazayê" weşandiye. Der heqê îstatîstîka hejmara Abhazan de jî tablo amade bûne. Şemseddin Samî bi navê "Laz û Lazîstan" Alî İslamoxlû "Bingeha peyîva" "Laz" ê Faik Hes "Tofana Nûh û Zarokên Nûh", Wolfgang Feürsteîn "Bi çavê yekî Alman gelê Laz", Fahrettin Çiloğlu "Riya xwe hebûnkirinê ji afirandina mercên hebûnê re weşandin. Di Kovarê de bi zimanê Lazî gelek nivîs ji hene bi vî zimanê herbest jî hatine nivîsandin.

Tawanbaranî Lokerbî û dadigay Lahay

Mwamer Qezafî Serokî Lîbiya raygeyanid ke dadigayî kirdinî tawanbarekanî rûdawî Lokerbî le Lahay lewaneye bibête hoy çare-serkirdinî nakokî le nêwan Lîbiya û Rojawada. Le kongirey giştî gelda le şarî sirt Qezafî wîfî: hendêk çarey ber çaw xiraw heye, yek lewane dadigayî kirdinî tawanbarekane le Lahay eger Lîbiyekan û xêzankanyan razîbin. Hrweha Qezafî wîfî em pêşniyare le layen cîmis siwayerî serokî rabîtey qûrbaniyekanî Lokerbiyewe pesenid kirawe ke biwe be qîseker be nawî ew Bîrtanyaney ke le rudawî teqînewey frokekeda le ser Lokerbî mirdin. Qezafî le dirêjey qîsekanîda wîfî siwayîr pêşniyarekî pêşkes kirdiwe ke delê Lahay Şiwênêkî gûncawe bo dadgaykirdin û Rojawayş delên ême le jêr giwşarî kesukarî kûjirawekanî Lokerbîdayîn, bemeş ew biyaniweyan namênêt. Rojnamey Al-Şerq-Al-ewset

Di şeva DEP'ê ya bajarê Stenbolê de;

Şahiya biratiya Kurd, Tirk, Laz û Çerkezan



Cîgirê Serokê Giştî yê DEP'ê Özçelik berendamên DEP'ê pêşkêş dike.

■ Şevê bi axaftina serokê DEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak dest pê kir. Parlak, li ser girîngiya hilbijartinê sekinî û ev yek ji vexwendiyar xwest: "Dewlet bi her awayî bi ser me ve tê, dixwaze ku em beşdarî hilbijartinê nebin. Ji bo em vê xwesteka dewletê berevajî bikin pêwîst e em bi dil û can, bêyî westan bixebitin. Ger em bi vî awayî bixebitin em karin bi ser bikevin."

Gêncî Rojava

Bi nêzîkbûyîna hilbijartinê belediyeyan ku di meha Adarê de wê çêbibin, partiyên siyasî, ji niha ve dest bi propagandayên xwe kirin. DEP'ê jî dest bi xebatê û çalakîyên xwe kir û roj bi roj bi kifşkirina berendamên xwe yê navçe û bajarên ketiye amadekariya hilbijartinê. Van xebatên xwe jî, di civîn û şevên kêf û şahiyê de pêşkêşî hilbijêrên xwe dike.

Wek tê zanîn di meha Adarê 1994'an de ji bo belediyeyan hilbijartin hene. Ji bo vê yekê temamî partiyên siyasî bêyî rawestan, ji bo ku di hilbijartinan de bi ser bikevin dixebitin. Partiya Demokrasiyê jî, ji bo ku xwe bi gelê Kurd û Tirk bide qebûlkirin, projeyên gelek balkêş pêşkêş dike. Ji van projeyan yek jê ev e ku, dema serokatiya belediyeyan di destê

wan de be û belediye baş nexebitin an jî gel ji kirinê wan ne razî bin, ew serokê belediye tenê du sal dikare li ser kar bimîne. Nexwe wê di sa hilbijartin çêbibe û gel kê bixwaze ewê were ser kar.

DEP jî bilî sazîyên pêşverû û sendîkayên karkeran, niha jî bi gelên wek Laz, Çerkez û pêşverûyên gelên din re hê jî berfirehtir dibe.

DEP'ê jî bo hilbijartinê li gelek deveran dest bi amadekariya hilbijartinê kiriye û berendamên xwe kifş kirine. Lê temamî berendamên xwe wê roja 30'ê meha Rêbendanê pêşkêşî raya giştî bike.

DEP'a bajarê Stenbolê roja 22.1.1994'an li "Ataköy" Mavi Marmara Et Lokantasi şevê bi navê "Şeva Piştgiriya DEP'ê" li dar xist. Di şevê de ji bilî mêvanên taybetî nêzî 2 hezar kesî beşdar bûbûn.



Dayikeke Kurd a Elewî pêşkêşiya listika semahê kir.

BERENDAMÊ BERPIRSIYARIYA WELATEKÎ

Şevê bi axaftina serokê DEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak dest pê kir. Parlak, li ser girîngiya hilbijartinê sekinî û ev yek ji vexwendiyar xwest: "Dewlet bi her awayî bi ser me ve tê, dixwaze ku em beşdarî hilbijartinê nebin. Ji bo em vê xwesteka dewletê berevajî bikin, pêwîst e em bi dil û can, bêyî westan bixebitin. Ger em bi vî awayî bixebitin em karin biserkevin."

Cîgirê Serokê Giştî yê DEP'ê Osman Özçelik jî, li ser pêvajoya nû û wezîfeyên partîvanan, bi giranî sekinî. Özçelik jî bo pêvajoya nû wiha got: "Em, ji niha û pê ve berendamê dosthilatiyê ne, ji bo berpirsiyariya Tirkiyeyê em berendam in." Özçelik, li partîvanan jî wiha deng kir: "Partiyeke ku berendamê berpirsiyariya welatekî be, ji her demê bêhtir pêdiviya wê bi her cure alîkarî û xebatê jî heye. Em bi gelê xwe bawer in, bi xwe jî bawer in." Özçelik jî bo hilbijartinê belediyeyan jî îdîa kir ku li kîjan deverê têkevin hilbijartinê wê bi ser bikevin; jixwe ew jî niha ve li gelek deveran bi çavên serketî dinêrin. Özçelik piştî ku

gotinên xwe qedandin berendamên ku li navçeyên bajarê Stenbolê belû bûne, bi vexwendiyar da naskirin. Berendamên çar navçeyên ku kifş bûne ev in. Alî Riza Yağmur (Avçılar), Orhan Kaya (Esenyurt), Alî Riza Dîzdar (Kağıthane) û Ertan İlden (Tuzla).

MA LAZAN ÇI ÇEK HILGIRTIYE?

Xwediyê Kovara Ognî (ya Lazan) Yılmaz Erdoğan jî, di axaftina xwe de got ku: "Gelê Laz alîgirê Têkoşîna Rizgariya Gelê Kurd e. Bila ev jî wiha bê zanîn." Erdoğan, li ser neheqiyên komara Tirk jî sekinî û axaftina xwe wiha domand: "Dewlet dibêje bila Kurd dev ji çekan berdin, emê mafên wan ên çandî bidin wan. Derewan dikin, qey Lazan jî çek hilgirtine? Ma Laz jî derketine serê çiya? Ku me kovareke çandî ya Lazan bi navê Ognî derxist, dewletê ew jî kom kir. Di pêvajoyê de dibe ku bigire jî, ji hovîtiya xwe. Gelê Laz û Kurd ev 2 hezar sal e ku li ser vî erdê dijîn. Mixabin bi avakirina Komara Tirk re, bi darê zorê bawerîya gelên me bi Tirkan hatiye. Ji ber ku bav û bapîrên me li ber xwe nedane, dewletê jî li gor dilê xwe gelên me asimile kirine. Dewlet, niha jî di tengasiyêke wiha mezin de ye ku, kî rastiyeke bibêje an jî binivîsîne, di cih de mudaxele lê dike û dibê derabe li pêşiyê."

Yılmaz Erdoğan di dawîya axaftina xwe de diyarî kir: "Gelê Laz jî, di têkoşîna we ya bi rûmet de li piştê we ye."

Şevê bi folklorê DEP'a navçeya Kağıthane yê "Koma Evîndar", bi çend govendên dora Bilîsê domand.

Wekî din di şevê de, Koma Dengê Azadî, Faruk Tuncer, Ferhad Tunç û M. Alî Eren bi stranên xwe vexwendî coş kirin.

Ji pirsîyariyê re 15 rojên din jî

Pêkutiyên li ser rojnameya Özgür Gündemê didomin.

Nûnerê Buroya Amedê Salih Tekin û 7 nûçevanên wê ku di 12'ê Rêbendanê de bi biryara DED'a (DGM) Amedê bi cerda polîs û jendirmeyan ji bo binçaviyê hatibûn hildan, ji bo berdewam kirina rewşa wan 15 rojên din jî hate xwestin.

Pirsîyariya 8 nûçevanê Gündemê tevî 2 mêvanê wê, li Komandariya Alaya Jendirmeyan a Amedê, tê kirin. Hate hinbûn ku daxwaza dirêjkirina binçaviya xebatkarên Gündemê ji aliyê Dozgerê Dadgeha Ewlekariyê ya Amedê (DED/ DGM) ve hatiye pejirandin.

Xebatkarên ku di bin çav de ne navê wan ev in: Salih Tekin, (Nûnerê Gündemê yê Amedê), Metin Dağ, Hasan Değer, Akif Şenyigit, Botan Önen, Emine İğdi, Cemal Dağ û Nevîn Güngörmüş. Ji aliyê din ve du mêvanên ku ji Buroya Belavkariyê jî hatibûn hildan ji wan agahî nîn e. Tê texminkirin ku ji wan jî 15 roj dirêjkirina binçaviyê hatiye xwestin: Nûnerê Buroya Amedê yê Gündemê Salih Tekin berê jî, ji aliyê Gerinendeyê Rêveberîya Asayîşê yê Şîrxexê Eriş Kizildağ ve gef lê hatibû xwarin, çî ma ku zêde nûçe ji herême digihîje navenda rojnameyê.

Gel ders û kursên zimanê Kurdî dixwaze


Dersên zimanê Kurdî pêwist in



Nurcan Uçar



Mehtap Gürbüz



Sefer İldemir



Nurcan Demir



Aynur Kiliç

Ev demek e ku Kurdên di saziyên Kurdî û yên ji derveyî van saziyan daxwaza ders û kursên zimanê Kurdî dikin. Ji xeynî daxwazê jî, gazinan dikin wek ku nikarin Kurdî bixwînin û binivîsînin. Ji bo bikaribin binivîsînin daxwaza ders û kursa zimanê Kurdî ji xebatkarên rojnameya Welat dikin. Û gel di vê baweriyê de ye ku, bi vê metodê de hejmara firotina weşanên Kurdî zêde bibe.

Li ser vê yekê lêpîrsînekê me pêk anî. Em vê xebatê li jêrê diweşînin.

Nurcan Uçar (Seroka Ciwanên DEP'a Emînonû)

Daxwaza we ya ders û kursên Kurdî ji ber çi ye, ji bo çi hûn dixwazin?

- Daxwaza me ew e ku ciwanên Kurd ên hatine asîmîlekirin zimanê xwe fêr bibin û bikaribin zimanê xwe bixwînin û binivîsînin. Exlebî ciwanên me bi Kurdiyeke seqet mijûl dibin, yan jî nizanin Kurdî bixwînin. Ji ber van sedeman rojname û weşanên Kurdî zehf kêmtên xwendin û firotin. Kesên dixwînin jî fêr nakin ji sedemên devokên herêman. Ku kursên Kurdî vebin hingê pîrgirêkên wiha jî dê ji holê rabin. Daxwaza Komîsyona me ciwanan ew e ku di nêzikayî de vebin. Û ez bawer im, ji xeynî endamên komîsyonê jî, dê gelek kes bînin kursa zimanê Kurdî. Ev zimanê me ye, divê em baş hîn bibin û bizanibin.

Mehtap Gürbüz

(Xebatkara Özgür Gündemê)

Tu rojnameya Welat dix-

wîni?

- Na, ez naxwînim ji ber ku ez bi Kurdî nizamim bixwînim.

Çawa dibe tu ji Amedê yî û bi Kurdî nizanî?

- Ez li metropolên Tirkan mezin bûme, li dibistanan, li kolanan heta bigihîje cînanan li her deverê ziman Tirkî ye û em jî bi Tirkî diaxivin. Me xwe bi zimanê Tirkî ve

weşanên Kurdî wek pirtûk û rojname fêr nake. Ji ber vê yekê daxwaza min kursa zimanê Kurdî ye. Kursa zimanê Kurdî dê kêmasiyên me temam bike.

Sefer İldemir (Endamê Rêveberiya DEP'a Fatîh)

Der barê dersê zimanê Kurdî de tu çi difikirî, dikarî ji me re bibêjî?

- Ez bawer im ku dê baş

piştguh dikin. Ev ne tişteki baş e. Ez bawer im ku dersên zimanê Kurdî hebe hem hejmara xwendekaran û hem jî firotina rojnameyan zêde bibe.

Nurcan Demir (Sekretera DEP'a Fatîhê)

Tu dikarî gîlî, gazin û daxwazên xwe şirove bikî der barê zimanê Kurdî de?

- Ji ber ku ez Serhedî

baş bibe û ev kesên ku nikarin Kurdî bixwînin yan jî zehmetiyê dikişînin gazin û lomeyan dikin dê bêgav bimînin ku li ser zimanê Kurdî bixebitin.

Ku kursên zimanê Kurdî vebin tu dê herî kursê?

- Belê, ez dê herim. Ev daxwaza min e.

Aynur Kiliç (Ebûqat)

Çawa tu didî xuyan, tu nîvî Kurdî nîvî Tirkî, li nav hev dixî, ji ber ku ji Mezrayê (Elezîz) yî û Kurdî nizanî. Ev çima wisa ye? Û daxwazên te em fêr bibin ji kerema te re?

- Bavê min Tirk e, dapîr û diya min Kurd in. Ji ber ku bavê min Tirk bû em jî malê ve tev bi Tirkî diaxivîn. Rabûn û rûniştina me tev bi Tirkî bû. Lê di dema dibistana min a yekemîn de meraqa zimanê Kurdî ez girtim. Hingê min tim jî dapîra xwe navên tiştan dipîrsî bi Kurdî çi ye. Bi vî awayî ez gelek peyvên Kurdî fêr bûm. Ji ber ku derdora me tev Kurd bûn, fêrbûna Kurdî fersendekê mezin bû ji min re. Min zehmetiyê wisa mezin nedikişand. Lê piştî em hatin metropolan, ji Mezrayê (Elezîz) dûr ketin, tiştên min zanibûn jî min ji bîr kir. Hêviyê min hebû mîrê min, wê min fêrî Kurdî bike, lê mixabin ew jî, ji aliyê dagirkeran ve hatibû asîmîlekirin. Daxwaza me jî ew e ku li navendên DEP'an dawiya heftiyê çend saetan dersên Kurdî bê dayîn, bi vê metodê gelek kes dê Kurdiya xwe bi pêş ve bibe, hem jî yên wek min dê Kurdî fêr bibin.



Zimanê Kurdî pêwistîrîn e ji bo zarokên Kurd.

girê dabû. A rastî em jî zimanê xwe (Kurdî) aciz bûn her çiqas zimanê me bû jî. Lê niha ez hezar poşman im û xwe sûcdar dibînim. Ji ber vê yekê min niha pirtûkên destpêka zimanê Kurdî kirin û zimanê xwe fêr dibim, mecbûr im fêr bibim.

Daxwazeke ders û kursa zimanê Kurdî heye, tu çawa dibînî?

- Zehf baş dibe, ji ber ku mirov bi serê xwe zimanê Kurdî fêr nabe. Fêr bibe jî

û balkêş bibe. Ku di rojnameya Welat de 12 rûpel wek ders bê nivîsandin dê gelek baş bibe, ji kesên ku Kurdî nizanin yan jî yên nû dest bi xwendina Kurdî kirine re. Ez di wê baweriyê de me ku, ev metod divê ji destpêkê de hebûya. Ev pêwistiyek e ji kesên nû re. Lê gelê me jî pêsponde ye ji aliyê zimanê xwe ve. Ji zimanên biyanî re ferheng û pirtûkan dikirin, zimanê biyanî fêr dibin û zimanê xwe

me, nivîsên rojnameya Welat ji min re zehmet tînin û bi ya min jî Welat zimanekî akademîk bi kar tîne. Ev zimanê akademîk hem jî min re, hem jî, ji kesên wek min re gelek bi zehmet e. Divê hêsantir bûya. Bala min dikişîne, hinek Kurd bi Kurdî baş dizanin, lê dema em rojnameyê Kurdî dirêjî wan dikin, hingê zimanê wan li hev siwar dibe nikarin bixwînin. Ji ber vê yekê kursên zimanê Kurdî vebin dê zehf

**Heupeyvîn:
S.S. Dilpolo**



Huner şerekî mezin e ku di hemû demên mezin de ji bo azadiyê hatiye pêkanîn.

ARAGON

PKK'ê TÜRKSAT xist

Guyana, Paris- Li gorî muxabîrê Ajansa Firandina Peykan (uydu) (AFP) a ku ji aliyê Fransa ve bi navê TÜRKSAT'ê hatibû çêkirin, di firandinê de pirr bi hêrs bû, sincirî û ket. Lê di vê arizyê de, li gorî muxabîr, sabotajek heye.

Di dema çêkirina peykê de PKK'ê yek ji wan mûhendîsan bi beroşek tîrşîk û bi du paket malboro (cixarê qunsor) bertîl kiriye û peyk wiha hatiye amadekirin ku piştî fiirînê bi çend deqeyan wê li hewayê biteribe.

Wek tê zanîn ku rayedarên Tirkiyeyê, her dem qala vê peykê (TÜRKSAT) dikirin û gef li PKK'ê dixwarin. Li gorî wan, ewê bi vê peykê ji tevger û lebatên PKK'ê haydar bibin.

Heta vê gavê berpirsiyarên PKK'ê tu agahî nedane.

Bi vê nûçeyê rayedarên Tirkiyeyê û Wezîrê Ragihandinê Mehmet Köstepik da zanîn ku haya wan ji vê yekê tune, lê li gorî agahiya rayedarekî Tirkiyeyê, ku naxwaze navê wî bê nivî-

sandin, dewleta Tirk piştî bûyerê heyeteke pispore neteweyî li kereke guhê wê kerr siwar kirine û bi Marşa Mehterê bi tevr û bêrê xwe ve, ji bo lêkolînê şandine Parisê.

Direktörê Giştî yê Şirketa Aerospitata Carlez Wigot, ev nûçe ne rast rê da û bi tenê ev got: "Endezyarekî me, bi eslê xwe ji Kerborana Mêrdînê ye, lê ev nayê wê maneyê ku ev ali-gîrê PKK'ê ye."

Pierre Bernade

Mizgefta Zübeyda Xanim

Li Qûbînê (Beşîrî) belediye kolanan restore dike. Mizgeftê jî li benda kolanê restore dike. Dema restorasyon tamam dibe, hem navê kolanê hem jî navê mizgeftê datîne Zübeyda Xanim. "Zübeyda Xanim sokak, Zübeyde camî"

Bi van tewrên Belediyê di navbeyna gelê Qûbînê de gengeşî çêdibe. Pirranî jî pîr û kal li hemberî lewheya Zübeyda Xanim in, naperijînin.

Yekî kal bi tinaz dibêje: Heyran Xwedê qebûl neke

em çawa bikin diya Atayê me diya me ye jî."

Çiqas jî kalo bi tinaz gotibe kalekî din bi gotina kalo zehf aciz dibe û wiha bersivê dide:

"Diya Atayê me ye, ne ya me ye, Atayê me jî ne ye me ye. Ma çî kiriye ji me re ku bibe diya me. Diya wan e. Ma xwe li vir.....kiriye ku em navê wê li mizgefta xwe deynin. Haa wa. Diya me li Enqerê ye û mebûsên me destên wê maç dikin. Ew diya me ye. Zibeydokê ne

diya me ye. Nexêr."

Hinek pîr û kal şaşo maşo bûn û di ber xwe de hûrhûr lorandin: "Yawo dibêjin ku ew Ermenî ne, pa!.."

Dîsa kalê 70 salî hêrs bû û ew bersivandin:

"Ne Ermenî ne. Kurê wan Ermenî ye?. Qene em zanin ku ew jî kur in, û esil û fesilê wan çî ye. Lê ew cihûyê Selanîkê. Ka bibêjin navê bavê wî çî ye?"

Seyîd A. Kerîm Qûbîn

Jûjî...

Doğan Güzel



KÊ ÇI PEKAND?

Li Tirkiyeyê rewşeke ku bibe sedemê devaulasyonê tune.

Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel

Xof û tîrsa welatê bindest giran e

Berateya Çarsim Axa

Kalê heftê salî li ser sewkiyê di nava nivînan de ûlta ûlta (kuxa kuxa) wî bû. Ên din li germdanê (sobê) civiyabûn. Dengê lëxistina deriyê derve hat. Kal qêriya:

- Ma hûn mirine! Dengê derî nayê we?

Xêlit bi ken bersiv da bavê xwe:

- Bavo ê tu dibêji ew nîn in, Xaço ye; wî îro tiştêk bi-hîstiyê. Ka bila were çî di barê wî de heye.

Xaço ket hundir. Diricifî, dev û lëvên wî li ser hev nedisekinîn. Xwe li ber cihê germ kudand û mijûl bû:

- Çi sîrr û seqemeke xedar a mirov dipertîne, mirovan dibirre; bayê kûr û derve jî sayî..

Xalit: "Lawo lê resqê te di qûna gur de jî heye. Çaya binê tendûrê, û qelya sor heye..

Xaço veqerîya ser kalo: "Kalooo, tu hê nemirî yî...!?"

Kalo awir da xaço û bi hêrs got:

- Erê Xaçoyê teberan, Xaçoyê serhevde.. Bû havîn here li der û dertûlan, askora pûşmûrde be... Ne karekî, ne şixulekî...Ew eziyet. Erê Xaçoyê bêdîn û bêîman...

Bêhna Xaço teng bû, xwe li stûxwariyê danî. Bersiv da:

- Kalo, kanê şixul, em çer bikin, yek tişt maye ew jî mirov herinê..

Kalo serî hejand û mijûliya xwe dom kir:

- Nerin deriya, bes êdî parseke para me be. Lê li erd û warê xwe bibin xwedî. Bikaribin li ser lingê xwe bisekinin, bibin mirov. Ma hûn li ser çî giliyî radikevin. Em werin mirina min: Ez mîna te bînamûs nîn im. Hetanî ev hezkirina vî welatî di dilê min de hebe mirin jî nikare bi min.

Xaço, pê xwe xelas bike rê avit ber:

- Me dîsa derdê kalo tev kir. Ka ez destê xwe bişom!

Wê demê derî vebû, keçika cînar ket hundir. Tasa di destê xwe de dirêjî bermaliyê kir û got:

- Xaltikê, diya min ew girar ji we re şand. Got: "Ji xaltika xwe re bibêje bila sibê were mala me, em teşiyê birêsin. Cînar jî tîn.

Bermaliyê rahişt firaqê û got:

- Hûn sax bin. Rahîla min. Ji diya xwe re bibêje min şeş cot gore tov kir! Rahîla li derketinê bû, Xaço jê re got:

- Ji bavê xwe re bibêje bila serê wî sax be!

Xalit bi acêbmayî pirsî:

- Çima Xaço, ma çer bûye.

- Erê ez yekî eware û betal im, lê bi her tiştî dizanim! Şeva berê leşkeran Çarsim Axayê wan kuşt.

- Tu rast dibêji?

- Erê... bi xof û tîrs kişiyane ber zinar. Çarsim Axa di hundir de nişka ve ziriya.. Wan bi hev re lê reşandinê. Nizikî hezar derbê (gule) berdanê. Ma tu nabê çima kûçikê vê taxê bédeng in. Gişt li ser berata Çarsim Axa tîr bûn...

- Kesî sed hezar tê nedida. Hezar derb sê milyon. Tek zirneke kerê li welatê me sê milyon e. Kî dizane, ewê di nûçeyan de bibêjin me li filan derê deh heb kuştin.

Kalo serê xwe rakir û bi dengê giran û şewate got:

- Xof û tîrsa welatê bindest giran e, pola li ber dihele, çiya û banî li ber serê xwe datînin.

Amadekar: Jêhat Gingim

DED dixwaze Welata geş vemirîne!

Navenda Nûçeyan- Doza ku li rojnameya me û Berpirsiyarê Nivîsaran hatibû vekirin, daraziya (mehkeme) wê li Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (DED-S/İDGM) di 31.1.1994'an de saet di 9.20'an de dest pê dike. Doz bi mebesta ku bi riya çapemeniyê li dijî yekîtiya welat û neteweya Tirk propaganda hatiyekirin, vebûye û radana Welat û girtina Berpirsiyarê Nivîsaran Mazhar Günbat tê

xwestin. Sebebê doz vekirinê du nivîsên hejmarê Welat a 73'yan e. Yek jê ya manşetê ye û bi navê **"Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê"**, a din jî di rûpela 5'an de bi ser navê **"Li Edeneyê polîsan teror pêk anî"** ye. Nivîsa manşetê ku ji rûpela pêşîn dest pê dike û di rûpela 8'an de tevî hinek a nehan diqede, li ser **Qetliama Sêwazê** ye ku 36 roknakbîr di Otêla Madimakê

de ji aliyê nîjadperestan ve bi zindî hatibûn şewitandin û meşa ku li Enqerê ji bo merasîma wan çêbûbû. A din jî li ser bûyerên ku li Edenê di meşa cenezeyên gerîlayên ARGK'ê de, di 6'ê Tirmehê de qewimîbû ye.

Di îdianameyê de ji ber herdu nivîsan, li gorî **"Qanûnê Antî-terorê"** ya bi hejmarê **3713** xala **8/1-2** û xala 80. a Qanûnê Cezayê ya Tirk cezakarîna **Berpirsiyarê Nivîsaran Mazhar Günbat** û ji aliyê din ve jî li gorî 2/1 a ku li **Qanûnê Çapemeniyê** ya bi hejmarê **5680** ve hatiye zêdekirin, radana **Welat** ji DED-S'ê tê xwestin.

Di vê doza ku ji bo darizandina (mehkemekirina) Berpirsiyarê Nivîsaran û rojnameya me Welat hatiye vekirin de, welê dixuye ku wê tiştine balkêş biqewimin. Ji ber ku carek doz bi serê xwe tiştine girîng di hundirê xwe de dihewîne:

1. Di îdianameyê de zimanê Kurdî raste rast hatiye nivîsîn.
2. Salox ji yekî "zanayê sondxwarî" tê dayîn ku nivîs ji aliyê wî ve hatine wergerandin.
3. Cara pêşîn e ku doz li naveroka nivîsên bi Kurdî tê

vekirin 4. Yekemîn car e li Turkiyeyê nivîsên rojnameyê xewrû bi Kurdî ji aliyê rejîma Kemalîst ve tê darizandin.

Ev her çar xalên girîng ên dozê li aliyekî, wê Berpirsiyarê Nivîsaran Mazhar Günbat jî parêziya xwe bi Kurdî bike. Ev helwest jixwe bi tenê ji balkêş û girîngtirina dozê re besî xwe ye.

Ji aliyê din ve tê etir (maraq) kirin ku, wê helwesta dadgehê çawa be û bi çi awayî û azîneyî ve daraziyê bidomîne. Ji ber ku ev cara pêşîn e dozeke bi vî rengî diqewime û tengasiyên hiqûqî yên dewleta Tirk der barê zimanê Kurdî ve jî tên zanîn.

Berpirsiyarê Nivîsaran ê rojnameya me Mazhar Günbat, vê rewşa hanê û îdianameyê wiha dinirxîne:



Hejmarê me ya 73'yan ku di heqê wê de doz hatiye vekirin tê dîtin.

"1. Ev doz di encamê de dibe sedemê qebûlkirina zimanê Kurdî, bi awayekî fermî. Dibe ku bi zanebûn û plankirî ev doz hatibe vekirin. Jixwe di fiiliyatê de zimanê tê bikaranîn, tenê di resmîyetê de nehatiye bilêvkirin. Ne bi zanebûn be jî, bêyî hemdê wan be jî di encamê de, zimanê Kurdî tê qebûlkirin.

2. Her çiqas ev doz bêyî hemdê Turkiyeyê be jî, rewşeke nû ya erênî derdixe holê. Li aliyê din dewlet li dijî qanûnên xwe derdikeve û Qanûnê Bingehîn bînpê dike. Ji ber ku di Qanûnê Bingehîn a Tirk de, hebûna zimanê Kurdî nayê pejirandin. Di nav saziyên dewletê de, yeke ku ji xwe re zimanê Kurdî kiriye mijar û dide hînkirinê nîn e."

DED'a Stenbolê roja 31'ê Rêbendanê wê ji bûyereke dîrokî û balkêş re şahidiyê bike. Rojnamegeriya Kurdî û zimanê Kurdî wisa dixuye ku wê di qonaxeke girîng de biborin. Nivîsên bi zimanê Kurdî bi çi awayî û bi çi qanûnî ve wê bêne darizandin, qanûnîbûna "zanayê sondxwarî" ji bo wergerandina zimanê Kurdî bi çi ve wê bê girêdan, ji parêziya bi Kurdî ya Berpirsiyarê Nivîsaran ê Welat re çi helwest û bertekiyê (reaksiyon) bidine nîşan û hwd. tene etirkin û ev pirs li hêviya bersiv û îzahê ne.

ROJEVA WELÊT

Doz û peywirên me

Dîroka me Kurdan bi qewmînen balkêş dagirtî ye. Ev tiştine balkêş û girîng hê jî diqewimin, tên serê me. Lê di vir de tiştê girîng û hêjayî gotinê ev e. Em, çiqas bûyer û diyarde (fenomen) yan li gorî berjewendiyên xwe yên neteweyî û civakî bi kar tînin, berê wan ji bo vê yekê dizivîrin, diguherînin? Em çiqas bi dû bûyeran dikevin, bi wan ve dizeliqin, pê digirin, jê venagerin? Em dikarin bibêjin ku me tu car dev ji mafên xwe yên hîmî, demokratîk bernedaye, em li hêviya kesên din neman ku ji bo me têbikoşin..?

Ji me saxan re diyar e, pirs zehf in. Lê divê bersivên wan jî bi awayekî zanistî, bêyî hes û pêjnê, bêyî meyl û xûziyê bê dayîn. Heke ne welê be, em nikarin bigihin armancê, encamê. Dem hatiye, heta dibihure. Êdî pêdivî ji têkoşîna bi her alî re heye. Divê pirralî xebat bê kirin. Her kes di cihê xwe de, di ber xwe de li xebata bi destxistina mafên xwe yên binyadî bixebite. Li bend û hêviya kesî nemîne,

Rewşeke nû û girîng li ber me, li pêş çavê me diqewime. Ronajmeyeke xewrû bi Kurdî, ji ber naveroka nivîsên xwe, doza radanê lê tê kirin, dîsa ji ber her du nivîsên di hejmarê 73'yan de, Berpirsiyarê Nivîsaran li gorî "Qanûnê Antî-terorê" jê re ceza tê xwestin. Di îdianameyê de zimanê Kurdî raste rast tê bilêvkirin. Hebûna "wergerekî sondxwarî" tê de hatiye daxuyandin.

Di qanûnên dewleta Tirk de bi awayekî resmî zimanê me nayê pejirandin. Nivîsên bi Kurdî cara pêşîn e ku ji daraziyê re dibine mijar. Tengasiya dewletê ji aliyê mewzûata hiqûqî, ji hêla zimanê Kurdî ve rind tê zanîn. Gelo wê bi çi rêyî Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê me bidarizîne, tê etirkin.

Di vê dozê de ma barên ku divê em hilgirin, pişta xwe bidine berê, nîn in? Belê hene. Pêwist e ku em nehêlin dozê li me bikine xewnerok. Di vî warî de jî têkoşîn li benda me tevan e. Şerekî hiqûqî, têkoşîneke zexm û gurr hewce ye ku li dadgehê biqewime. Bikin ku doz navneteweyî bibe, dengvedana dozê deyn e, li stûyê me ye.

Merc û şert li rê ne, zêdekirina tengasiyan li dewletê, di destê me de ye. Em xîçikekî jî di vê dozê de bixine sola dewletê, ji bo me kar e, qezenc e. Heke bawerîya me bi hêza têkilbûnê heye û pê berê bûyeran diguhere, nexwe em çi dipên, li kê digerin ku bê ji dêla me ve, me biparêze? Doz doza me ye, yên ku têbikoşe ji bo bi destxistina maf jî, divê em bi xwe bin. Di 31.1.1994'an de li DED-S'ê hemd û vîna xwe em bidine peyivandin. Ji bo mafên xwe yên demokratîk û hiqûqî em bi wan ve bizeliqin, xewa şevan li wan biherimînin. Gotinên pêşiyar, "Zehf in bêmaf in", "Pirr in bêsir in" divê ji bo rewşa me êdî ne di cih de bin. Werin em bi hev re çarenûsa xwe bi destê xwe biguherin. Peywir (wezîfe) a xwe em bêyî dilxûşîyê pêk bînin.

Buroya Gündemê bombe kirin

Buroya Gündemê ya Enqerê roja 27'ê Rêbendanê seat li dora 11'ê şevê, ji aliyê mirovên nediyar ve hate bombekirin. Di vê bûyerê de ji ber ku, xebatkarên Gündemê ne li wir bûn, tu mirin û birîndarî çênebû. Lê ji aliyê madî ve zîrareke mezin çêbû. Li gorî agahiyên ku, ew rojname dide, tundiya bombeyê pirr zêde bûye.

Ev bû demeke ku, kontr-gerîla berê xwe dayê Kurdên li metropolan. Çend rojan berî vî jî hinek karistanên Kurdan û DEP'a Yenimahalleyê (Enqere) hatibû bombekirin.

MÎT li derve nasekine

Li Parîsê ew taxên ku Tirk û Kurd lê disekin, Saziya Îstixbarata Neteweyî (MÎT) a Turkiyê li hember qedexetiya qanûnên Fransayê, belavokek belav kir. MÎT'ê ev belavok bi saya qutiyên postê û avêtina ber şemûgan anî pê. Di belavokê de wiha tê gotin:

"Birayên me yên li xerîbiyê ev rewşa ku îro hûn tê de ne, li gorî mezinahiya cedê we û we nîn e. Mezinên we ji bo aştiya dinyayê xebitîn û hûn jî bi wan ve girêdayî ne. Lê îro li ser serê we teşqeleyek digere. Lazim e hûn kotekiya PKK'ê nepejirînin û li hemberî wê derkevin. Lewre Apo û PKK eşqiya ne û li gelê me zilmê dikin. Ji ber wê pêwist e hûn nehêlin PKK ji we pere bistîne, Fransa cihê rizgariyê ye, lazim e hûn li hemberî vî çeteyê derkevin. Li gorî agahiyên herêmê ev belavok ji bo ku Tirk û Kurd ji hev sar bibin hatiye belav kirin.

Dewletê kirra xwe daye Cizîrê

■ Ta niha li Cizîrê bi hezaran insan ketine bin çav, gelek insanên welatparêz hatine kuştin. Gelê Cizîrê ji ber terora cerdevanan û hêzên dewletê, koçber bûye. Ew cihên ku vala dibin, cerdevan tên dikevinê û hebûn û malê Cizîriya dikevin destê cerdevanan. Ev bûyer bi pirranî li Taxa Cûdiyê û yên din diqewimin.



Tu car top û fanq ji Cizîrê xalî nabin.

M. Zahir Kayan

Cizîr ji bo serhildanê, ji bo destpêkirina rîya Kurdistanê, potansiyeleke herî mezin e. Dewlet ji bo îro û ji bo pêşerojê, dixwaze rewşên Cizîrê biguhertin û Cizîrê ji hin taybetiyên wê yên dîrokî biqetîne. Ji bo wê, gelek politîka xistine nav kar û barên xwe. Jê hinek xîz û nezanên Kurdistanê, Perwerdehiya tîmên taybetî, rûxandî û jîholêrakirin, ji welêt dîrxistina Kurdan û hwd. in. Dewletê cara pêşîn mezinê Eşîreta Tayanê Kamîl Atak xapand û ew kişande aliyê xwe. Bi saya wî li ser gelê Cizîrê terore dimeşîne. Dewletê Eşîreta Tayanê (gîş bûbûn cerdevan) xiste Cizîrê, cihên ku ev eşîret lê hewirî, jora Taxa Cûdiyê bû. Di 10'ê Berfanbarê de gerilayên ARGK'ê avête ser ta xê, ji cerdevanên eşîreta Kamîl Atak, 6 cerdevan kuştin.

Tewra wê eşîretê û ya Kamîl Atak di gel tewra dewletê ji bo qirkirina gelê Cizîrê, her çû xurt bû. Hêzên dewletê bi hemû çalakiyên xwe ve li Cizîrê bi vî awayî dixwazin bi ser bikevin. Li Cizîrê Taxa Cûdî, Sûr, Kurtuluş, Daxkapî demeke dirêj e ku bûye hedefa cerdevanên Kamîl Atak û hêzên dewletê. Di serê Rêbendanê bi vir ve êrişên dewletê bi giştî li ser Taxa Cûdiyê û taxên din pêk tî. Dewlet bi panzeran her car êrişan dibe ser van taxê hanê û îşkence û terora xwe dide meşandin û gelê van taxên hanê ji cihê wan dide dîrxistin. Kamîl Atak bi alîkariya dewletê dixwaze van taxên han vala bike û kontrola çûyîn û hatina Cizîrê bixê destê xwe. Hêzên dewletê her car Cizîrê didine ber gullebaranê û bi hezaran insan dixine bin çav. Mermiyên roketan îsabetî malan dikin û bi dehan insan tene kuştin. Ji bo hilbijartinê ji kar û barê dewletê li gorî van provakasyonên han in. Dixwazin Kamîl Atak bikin serokê Belediyeya Cizîrê. Armanca dewletê, çavtirsandina

gel e û ji bo hilbijartinê listikên nû ne. Mebûsên Şîrnexê Orhan Doğan û Mahmut Alınak, sedema provakasyonên dewletê beyan kirin. Dewlet her car êrişan dibe ser Cizîrê û ji xwe re êrişên PKK'ê dixê sedem. Rûxandina Cizîrê ji çapemeniyê û ji dinyayê vedişêre. Ta niha li Cizîrê bi hezaran insan ketine bin çav, gelek insanên welatparêz hatine kuştin. Gelê Cizîrê ji ber terora cerdevanan û hêzên dewletê koçber bûye. Ew cihên ku vala dibin, cerdevan tên dikevinê û hebûn û malê Cizîriya dikevin destê cerdevanan. Ev bûyer pirranî li Taxa Cûdiyê û yên din diqewimin. Li ser van qewimînan li Almaniyayê "Hevgirtina 90/ a Keskan" hemû sazîyên Demokratîk yên Almaniyayê, ji bo êrişên dewletê yên li Cizîrê didomin, gazî Tirkiyê kirin.

Li gorî agahiyên rojnameyan, bûyerên ku li Cizîrê diqewimin, provakasyonên ji bo hilbijartinê ne. Dewlet li Şîrnexê, li Licê çî kiriye dixwaze li Cizîrê ji bidomîne. Taxa Cûdiyê di bin hemû êrişên dewletê û yên cerdevanan de maye. Cerdevan li ser gel terore dimeşînin, dewlet alîkariyê dike. Di serê Rêbendanê vir ve hêzên dewletê bi sedan car êriş birine ser Taxa Cûdiyê, sûr û taxên din. Ku ev êriş bêne nivisandin wê demê armanca dewletê ya li ser Cizîrê bi hêsani bête fêmkirin.

Di 8'ê Rêbendanê de dewlet ceryanê li gelek taxên Cizîrê dibire. Di 9'ê Berfanbarê de piştî êrişa gerilayan, hêzên dewletê avêtin ser gelek taxên Cizîrê, bi sedan kes xistin bin çav û piştî gelek îşkenceyan ew qefle berdand. Hêzên dewletê di 10'ê Rêbendanê de li Tabûra Tanqê taxên Cizîrê dane ber bombeyan, di bûyeran de 6 kes hatin kuştin û 5 kes birîndar bûn. Piştî bûyerê tîmên taybetî û cerdevan taxên Cûdî û Sûrê hildidine ablûkayê, ji bo ku gel ji van taxan koç bike teroreke nedîtî meşandin. Leşker û tîmên taybetî di 6'ê Rêbendanê de ji navçe dabûne ber gullebaranê û 3 kes kuştibûn, 4 kes birîndar kiribûn. Gelê Taxên Cûdî û Sûrê piştî êrişa dewletê di 10'ê Rêbendanê de, ji malên xwe derdikevin û dikevin mizgeftan. Bist mizgeft bi vî awayî tije koçber dibin. Hêzên dewletê di 22'ê Rêbendanê de êriş birin ser taxên Cizîrê 500 kes xistin bin çav, di saet 07.30'an de jî tîm, polis û cerdevan der û dorê Taxên Sûr, Dağkapi, Alîbey, Dicle û Meydanbaşı 100 kes xistin bin çav. Di van êriş û lêgerînan de dewletê gel çavtirsî kir û xwest ku ew giş bibin cerdevan. Di 23'ê Rêbendanê de hêzên dewletê êriş bire ser taxên Cizîrê, 150 dikan xesirand, 30 mal şewitand û gelek kes xiste bin çav. Hêzên dewletê bi van êrişan jî qîma xwe hilnedan û navê Taxa Cûdiyê

Li Îspanyayê greva giştî

Nakokiyê di navbera sendîka û hikûmeta Sosyalîst de gihişt radeya greva giştî. Bi biryara sendikayan li dijî politikayên hikûmetê, ji bo 24 seatan biryara grevê hate dayîn, ev grev di roja 27'ê Rêbendanê de pêk hat. Biryara hikûmetê ku hinek reforman têxe rojevê bû sebaba grevê, li gorî wê reformê wê karsaz karibin bi hêsani karkeran ji kar biavêjin. Li Îspanyayê rêje (nîsbet) ya bêkaran ji sedî 23' ye.

Li aliyê din, roja 26'ê Rêbendanê li paytexta Îspanyayê, li Madrîdê, di avahiya Wezareta Finansê di Şaxê Enstîtuya Kar de du bombe teqiyay, bi teqîna bombeyan mirovek birîndar bû. Berpirsiyariya wê bûyerê rêxistineke bi navê (Grubên Antî-Faşîst Şoreşgerê Kewçêrê yê Yekemîn) GRAPO'yê hilda ser xwe. Xeynî wê bûyerê ETA'yê jî bombe avêtin çar bankayan.

NÊRÎNEK

Îbrahîm Xort

Netewe û avahî

Dema ku em tê de dijîn, bi her awayî dijwar e. Ev dijwarîbûn, ne tenê di têkoşîna çekdarî de, di pîr wan de xwe dide xuyakirin. Sedemê wê jî ew e ku Kurd ne xwedî mîrasekê ne. Em dikarin bibêjin ku ji tûnebûnê her tiştê me Kurdan ava dibe. Yanê ji sifirê!

Têkoşîna me Kurdan îro di nav van astengiyên de, di her beşî de gav bi gav ber bi serfiraziyê ve diçe. Bingeha wê serfiraziyê jî, li gorî baweriya min; gava ku îro em lazimiya tiştêkî dibînin, em xwe li ser serî(!) diavêjin navê, piştî ku em dikevin nav, kêmasî û şaşiyên xwe dibînin û xebatên xwe jî, ji bo ku em van kêmasî û şaşiyên ji holê rakin, dimeşînin. Ev jî, tiştêkî diyalektîk e.

Avahî û birêvebirina van avahiyan bi xwe, huner e. Bala ku em tu carî nebûne (yan jî pîr kêr) xwedî avahiyên neteweyî, em bêmînak in. Gava ku mirov bêmînak be jî, avahiyên ku çêdibin, ji aliyê xebatkarên wê avahiyê ve tê bikaranîn. Ev bikaranîna wan xebatkarên, demekê di nava şaşbûnê de diçe! Ger Kurd xwedî mînakên avahiyên neteweyî bûna, jixwê wê tu problem derneketana. Mirov wê gavê dikaribû ji xwe re mînakek bigirtana û hewl (qewet) jê bistan-dana û neketana nava şaşî û kêmasiyan.

Belê, bi rastî li gorî ku em ewqasî bêyî xwedî mîrasên avahiyên neteweyî ne jî, hewl û mînakên mezin, têkoşîna bi xwe ye. Lê ev têkoşîn, carina kesên ku di van avahiyan de dixebite dixê nava zexeliyan (tembelî) jî. Tê gotin; çawa be li welêt şer heye, gerîla heye, gel xebatê dike(!) û hwd. Ev ne sîcê têkoşînêye, sîcê xebatkarên van avahiyan e.

Tu tişt mirovan ji têkoşîna civakî zûtir, naguherîne. Ev zûtir guherîn e ku, têkoşîna van deh salan, Kurd bûne xwedî şexsiyeteke (yan jî, ev daxwaz bi wan re çêbû). Têkoşînê, rê ji bo hemû Kurdan vekir. Îro her Kurd bi rehetî dikare, ji bo Kurdîtiyê bixebite. Berê dikaribûn bigotana em nikarin xebata çekdarî, tevgerêdana bi dizî (îlegal) û hwd. bikin. Geh yê digotin em mezin e, yê digotin em xwedî zarok in, yê digotin em nexwê in û hwd. Lê îro wê nikarin bibêjin. Her Kurd li gorî qeweta xwe, li gorî hişê xwe û li gorî xwe dikare li cihekî bixebite. Bi dehan avahiyên Kurdan yan jî, avahiyên ku mafên Kurdan jî diparêzin hene.

Ger konevan (polîtîkvan) be va ye DEP, ger rojnamevan bi va ye Özgür Gündem, Welat, Özgür Halk, Rewşen û hwd. Ger li ser zanistiyê dixebitî va ye Enstîtuya Kurdî, ger hunermend û li ser çandê dixebitî va ye NÇM (MKM), ger li derveyî welêt bi jî, va ye YRWK, HUNERKOM, HEVKOM. Mirov dikare mînakan zêde bike. Bes ku xwesteka xebatê bi mirov re hebe.

Di dîrokê de Kurd, tu deman weke îro nebûye xwedî avahiyên. Divê her Kurd qîmeta van bizaniyên û lê xwedî derkeve. Ger mirov doza tiştêkî dike, divê mirov li gorî qaîdeyên wî tiştî bimeşe, yana serketin ne mîmkûn e. Madem em doza welatê xwe dikin, berî her tiştî divê em li van avahiyên xwe xwedî derkevin. Çima ku ev avahî, wê bibin bingeha birêxistina welêt. Bingeh çawa bê danîn, ser jî, wê wilo ava bibe. Dema ku em tê de dijîn jî, bingehên pûç naxwaze!

Gava ku em li dîroka gelan dinêrin jî, ev rastî derdikeve hemberî me. Li pîrî welatan, yek avahî bûye bingeha têkoşînê. Ev avahî, yan komaleyek e, yan rojnameyek e, yan sendîkayek e. Yanî pêşkêş ji bo bingehê qewîm ev avahî avêtine. Dû re tevgerêdan yan jî partî derketin. Ê yê me Kurdan îro hemû hene. Wê gavê, ji bo hemû Kurdan ku ji bo welatê xwe naxebitin, bi kêmasî em dikarin bibêjin, "Ji Xwedê bitirsîn!" Qet nebe, werin van avahiyên xwe xurt bikin! Hey tiştêkî din ji we nayê.

Li Meksîkayê mafê mirovan di bin piyan de

Artêşa Meksîkayê, mafê mirovan dide bin piyan. Li gorî daxuyanîna rêxistinên mafê mirovan û gundiyan xwecih, hêzên dewleta Meksîkayê piştî ku cihên di bin kontrola gerilayan de bûn, xistin bin kontrola xwe, bi dehan kes girtin bin çav û îşkence li wan kir. Kesên ku, bi wan îşkence û lédan dibe endam û dilxwazên Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Zapatan e.

Di daxuyaniyêke xwe de "Amnesty International"ê (Efûya Navneteweyî) roja 26'ê Rêbendanê daxuyand ku, li nîyeyê wan jî bo çavdêriyê, di navbera 18 û 22'ê Rêbendanê de li herêma Chiapasê bûne û wan der heqê kirinên dewletê yê ji derî mafê mirovan wek, îşkence kuştina bêdarizandin, binçavkirina ketûber de gelek çavdêrî standine. Serokê Meksîkayê Salinas got ku, wan komîsyoneke taybetî ji bo vekolînê bi rê kirine û wê çavê xwe ji bûyerên bi vî rengî re negirin.

Bersiva rexneyeke bi lez

Kurdî nav e û bi wateya zimanê Kurdan e

Baran Rizgar

London- Di hejmara Welat a 92'an de nivîsereke min bi ser-nivîsa **"Yê Kurdî, yê Kurdan û yê Kurd"** hat weşandin. Wek ku ji semivîsê jî diyar e, ew nivîs li ser mesajên ku ev her sê awa di hundirînî radiweste. Bi rastî, nêrînên min ên li ser vê babetê bi zelalî di wê nivîsê de hatine gotin û di normalê de min pêwîst nedidit ku ez careke din li ser wê rawestim. Lê belê, di hejmara 93'an de, nivîsereke birêz Zana Farqînî bi navê **"Bersivê der barê zimên de"** hat weşandin ku tê de, li gel hin nêrînên me yên muştêrek, hin rexneyan jî dike. Birêz Farqînî dibêje ku "Mamoste di wê nivîsa xwe de bi ya min di gel hin agahiyên ronîker ên li ser zimên, hinên şaş jî dabûn." Paşê jî dibêje, "... Di rexnekirinê de çewtîyê jî dike." Îcar sedema ku min hewce dît ku ez di sa li ser vê babetê rawestim, ev peyv in. Lewre li gor birêz Farqînî min hin agahiyên şaş dane û di rexnekirinê de jî çewtîyê kiriye. Wê gavê, min xwe berpirsiyar dît ku ez li ser nivîsa xwe û ya birêz Farqînî di sa rawestim û heke agahiyên şaş û çewtîyê tê de hebîn, wan diyar bikim û ji xwendevanan lêborînê bixwazim.

AGAHIYÊN ŞAŞ ÇI NE?

Lê belê, min di nivîsa xwe de tu agahiyên şaş û çewtî nedît. Her wisa ji nivîsa birêz Farqînî jî diyar nabe ku agahiyên şaş çî ne û çî ye ku min nivîsiye çewt e. Tenê mirov têdigihîje ku ew difikire ku "... Mamoste **'î'** ya tewangê ya ye-kehejmariya nebinavkirî ya zayenda nêrîtiyê û ya navçêkirin û pêwendiyê tevî hev kirine. Bi şeweyekî din em bibêjin, **'î'** ya tewangê û ya ku bi alîkariya daçeka **'bi'** yê tê dawîya peyvê ku wateya **'ish'** a Îngilîzî û **'çe'** ya Tirkî dide, ji hev demexistine. Di zimanê Îngilîzî de bi alîkariya paşgira **'ish'**ê navê zimanê neteweyekê, di Tirkî de bi **'çe'** yê û di Kurdî de jî bi daçeka **'bi'** yê ku tê pêşîya peyvê û bi alîkariya **'î'** ya paşgir, tê çêkirin. Ku em bi mînakan mijarê ronî bikin:

"Ez bi Kurdî dizanim Rizgar bi zimanê Erebi dipeyive"

Rewşên awarteyî jî hene, mînak:

Baran hinî Tirkî dibe Almanî çawan e?"

Birêz Farqînî piştî van gotinan li ser tewandina navên Kurdî disekine ku rave bike ku **'î'** ya di **'Kurdî'** de ne ji bo navçêkirinê, lê belê ji bo tewandinê ye. Îcar wek ku min li jor jî got, ji nivîsê tu agahiyên şaş an

Ma gelo **"Kurdî, Îngilîzî, Tirkî, Erebi, Farisî û hwd."** bi tena xwe ne nav in û nayên wateya zimanên wan neteweyan? Li gora birêz Farqînî, na.

*Ji bo ku bibin nav, divê daçeka **'bi'** jî were.*

Pirr diyar e ku birêz Farqînî ev nivîsa xwe bi lez nivîsiye û li babetê qenc nekolaye. Ji ber ku ew bi xwe jî dibêje: "... di Tirkî de...", "... di Kurdî de..." û hwd.

Îcar hek Tirkî û Kurd ne nav bin û **'î' ji bo tewandinê be (di wan peyvên de **'bi'** jî tune), mirov dê çawa bibêje **"tê de"**.**

Navbûna wan, wek ku ew dibêje,

ne di rewşên awarte (îstîsna) de ye. **'î' tê paşîya Tirk, Kurdî, Erebi û hwd. û wan dike Tirkî, Kurdî, Erebi û hwd.**

jî çewtîyê min demakeve, lê belê birêz Farqînî dî re diyar dike min **'î'** ya tewandinê û ya navçêkirinê tevî hev kirine. Ji lew re ezê li ser vê bisekinim.

FONKSIYONA DAÇEKA **"BI"**

Ma gelo **"Kurdî, Îngilîzî, Tirkî, Erebi, Farisî û hwd."** bi tena xwe ne nav in û nayên wateya zimanên wan neteweyan? Li gora birêz Farqînî, na. Ji bo ku bibin nav, divê daçeka **'bi'** jî were. Pirr diyar e ku birêz Farqînî ev nivîsa xwe bi lez nivîsiye û li babetê qenc nekolaye. Ji ber ku ew bi xwe jî dibêje: **"... di Tirkî de...", "... di Kurdî de..."** û hwd. Îcar hek Tirkî û Kurd ne nav bin û **'î'** ji bo tewandinê be (di wan peyvên de **'bi'** jî tune), mirov dê çawa bibêje **"tê de"**. Navbûna wan, wek ku ew dibêje, ne di rewşên awarte (îstîsna) de ye. **'î'** tê paşîya Tirk, Kurdî, Erebi û hwd. û wan dike Tirkî, Kurd, Erebi û hwd. Her çiqas di Kurdî de wek; zimanê Tirkî/ Erebi/ Kurdî jî tê gotin jî, peyvika **"ziman"** ne pêwîstiyek, lê belê tercîhek e, bi pirranî gava ku mirov bi giştî li ser zimanê radiweste yan jî wan datîne ber hev, mirov wê bi kar tîne. Wek: **"Libûdçî,** gotineke ji Erebi û Tirkî gihaye hev û ketiye nav zimanê Kurdî." (1) Ji wê peyva Cegerxwîn jî diyar e ku Erebi û Tirkî bi tena xwe jî nav in, lê belê mirov dikare bibêje **"zimanê Kurdî"** jî, bes ne pêwîstiyek e. Wek ku li dereke din dibêje, **"Qefta şûr** ji Erebi û Kurdî bi hev ve hatiye..." (2). Em dikarin ji **Hawarê** jî peyvekê wergirin, **"Li Iraqê min Erebi û Îngilîzî gelek bihîstine..."** (3)

Mirov dikare wan bitewîne jî: Kurdiya wî ji ya min xwerûtir e.

Îngilîziya min zû pêş ve dikeve

Tirkiya nû ji ya kevn pirr cuda ye.

Xuya ye ku şaşî jî ravekirina fonksiyona daçeka **"bi"** derketiye, **"bi"** daçek û wateya **"bi**

wasiteya..." dide. Ango gava ku mirov dibêje, **"bi tiştêkî"**, mirov dixwaze bibêje **"bi wasita wî tiştî"**. Jixwe ji wê nav çênabin, rengdêr, rengpîşe (zerf) û daçek çêdibin. **"bi Kurdî"** jî tê wateya **"bi wasita Kurdî"**, anga em Kurdî bi kar tînin. Ez bi Kurdî dipeyivim (Ez bi wasita Kurdî dipeyivim, ez di peyivîna de Kurdî bi kar tînim, hwd.) ji ber ku mirov bi zimane-kî dipeyive, mirov zimane-kî napeyive. Her wisa, Ez bi Kurdî dizanim, anga ez dizanim bi Kurdî dipeyivim.

Gava ku mirov Kurdî û Tirkî dide ber hev, divê mirov pirr di-qet bike, ji ber ku; **1-Herdu** ziman ji bin ve ji hev cuda ne, **2-Tirkiya** nûjen di pêvajoyeke xweristî ya dirokî re derbas nebûye û pirr pê hatîye listin. Wek mînak, du fonksiyonên **Türkçe** yê hene: **Tirkî** û **bi Tirkî**. Ji van ya pêşî nav e, ya duduyan nav û daçek e. Ew **"Türkçe"** jî bo herdu rewşan jî bi kar tînin. Ji ber vê yekê, di ferhengên Tirkî-Îngilîzî de dibêjin, **"Türkçe: Turkish, in Turkish, written in Turkish, hwd."** Pirr mixabin ferhengên me yên Tirkî- Kurdî van fonksiyonan nadin. Min li yên birêz Îzolî û Torî nêrîn, herdu jî, ji bo **"Türkçe"** tenê **"Tirkî"** dinivîsin. Diviya herdu hemberiyên wê jî (**Tirkî, bi Tirkî**) bidana.

KURD, KURDAN, KURDÎ

Wek ku min li jor jî got, birêz Zana Farqînî nivîsa min bi lez xwendiyê û bi lez rexne kirîye. Ew dibêje ku, **"... Li gorî mamoste Baran Rizgar di 'civata Kurdî' de çewtîyêkê rêzimanî heye."** Diviya wî bidîta ku min xwestibû ku ez her sê awayan ne ji hêla rêzimanî, lê belê ji hêla watezaniyê (semantîk) ve rave bikim. Ji ber vê yekê, min di nivîsa xwe de qala tu çewtîyên rêzimanî nekiriye. Ji ber ku di her sê awayan de (mamosteyê Kurd, mamosteyê Kurdan, mamosteyê Kurdî) tu çewtîyên rêzimanî tunene. Lê belê, her yek ji wan çî mesajan dide me, di serê me de çî wateyan çêdikin, min xwest ez li ser

vê rawestim. Ango min xwest ez ji hêla watezaniyê lê kûr bibim. Ew her sê jî **"noun phrase"** (qedînek, komek, tamlama) in. Di qedînekên Kurdî de, her sê peyvîk jî (**Kurd, Kurdan, Kurdî**) dikarin wek peyvîka dawîn cih bigirin. Ji lew re ji hêla rêzimanê ve tu çewtî tune. Lê belê ji hêla watezaniyê ve, yek ji dewsa yekê bikaranîn hem mesajan tevî hev dike, hem jî çêja (tam) zimên kêma dike.

MÎNAKÊN XURT

Di xebatên xwe de, ez li meylekê rast hatim ku, van salên dawîn ew tiştên ku Kurd ji kevn ve wek yê Kurdan/ Kurd dibêjin, hin nivîskarên me wek yê Kurdî dibêjin. Mînakên herî balkêş ev in:

Ji bo ala Kurdan/ Kurdistanê dibêjin **ala Kurdî**

Ji bo nasnameya Kurdan dibêjin **nasnameya Kurdî**

Ji bo, gelê Kurd dibêjin **gelê Kurdî**

Ji bo pîrsa Kurdan/ Kurdistanê an pîrsa gelê Kurd dibêjin **pîrsa Kurdî.**

Mirov dikare mînakên zêde bike, lê belê ne pêwîst e. Îcar gava ku mirov li çavkaniyên Kurdî yên kevnepîr dikole, mirov tiştêkî bi vî awayî nabîne. Wê gavê ev meyl nû ye û bi ditîna min, bi bandora (tesîr) peyvikên Ewropîyan e. Ji ber ku di hin zimanên Ewropîyan de, peyvîkên wek **Kurdish** sê wate û sê fonksiyonên bingehîn hene: **Kurd** (netewe), **Kurdî** (ziman), **yê Kurdan/ Kurdî.** Di sa bi ditîna min, peyvîka **"Kurdî"** van her sê wateyan nahundirîne; hewce tune mirov wan baran lê bike; heke mirov lê bike jî ewê ji hêla watezaniyê ve derzekê li zimên bixe. Îcar min di nivîsa xwe ya berê de gotibû ku yê Kurdî tiştên bi zimên re eleqedar (ziman, metelok, stran, hwd.) dide. Ji ber ku ez difikirim ku Kurdî nav e û bi wateya zimanê Kurdan e. Birêz Farqînî jî dibêje na ew **"î"** ji bo tewandinê ye (zayenda nêr a yekhejmar). Îcar heke ew ji bo zayenda nêr a yekhejmar be, gelo wexta ku ew dibêje çanda Kur-

dî, ji Kurd qesta wî Kurdekî nêr e? Bêguman na. Ji lew re, ji rêzimanê bêhtir mirov ji watezaniyê li vê babetê binêre û guhê xwe bide meyla kevnepîr, çêtir û bi kêrtir e. Berî ku ez vê nivîsê biqedînim, ez dixwazim ji nivîsên kevnepîr çend jêderkan bidim ku diyar dikin ku pirr ji kevn ve, **yê Kurd** neteweyê (milyet) şanî dide, **yê Kurdan** bi giştî bi Kurdan/ gelê Kurd re têkildaran dike û **yê Kurdî** têkildariya bi zimên û tiştên bi zimên re eleqedar şanî dide. Dibe ku carinan bi awarteyî werin bi karînin, lê belê ji hêla watezaniyê ve meyl (temayul) ev e û ev meyl di cih de ye. Tu sedem tune ku em bi giştî jê avarê bibin û hema her çî me dît bi Kurdî girêbidin:

"Rostem û Cemşîd û Xalîd, Hemze yan Şêrê Elî/ Aferin ya şexsuwarê Kurd û rimbazê Erebi." (Melayê Cizîrî, Dîwan, rûpel:44, Weşanên Roja Nû; li gora pêşgotinê di 1631'an de qedandiyê.)

"Herdu terefan qebilê Kurmanç/ Bo tirê qeza kirine armanç."

(Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, rûpel:56, Hasat Yayınları, li gora pêşgotinê di 1695'an de qedandiyê.)

"Ser me ez xem cem'î bûne leşkerê Rom û Fireng"

"Çi bikim ez Dicle diçî pêl bi pêl ta mulkê Erebi"

(Şêx Abdurehmanê Axtepi, Dîwana Rûhî, rûpel:14, 44, li gora pêşgotinê li dor 1878'an)

"... ko beyreqên Kurdistanê jî meydanê hatibûn danalî û beyreqên Romîyan (Tirkan) hatine welatê me... ko mîletê Kurd serê xwe ji dijminê xwe re xwar kirîye... ko dengbêjên Kurd li ser Kemal Paşa belbestên mezin çekirîne...", *"Mezinên Kurdan jî nedixwestin ko..."*, *"Çaxa ez li Bexdayê seydayê perçê Kurdî bûm..."*, *"Xuya ye ku mîletê Kurd tiştêkî nemaye..."*, *"...zehra Farisî bi zehra Erebi şaş kirîye..."*

(Cegerxwîn, Folklorê Kurdî, rûpel:25, 34, 44, 47, 60, 64, Weşanên Roja Nû)

"... herçî xwenda û zanayên Kurdan bene...", *"Kurdino! Em mîletê Kurd..."*, *"...her wekî berdêla wê ya Erebi jî carinan dengdêr..."*

(Hawar, hejmar:1, 2, 3, rûpel:3, 12, 28 (1932)

"Bawerî û dinê Kurdan...", *"... hikûmetên Îngilîz û Frensîz heqê nijadê Kurd ên bingehîn qebûl kirin..."*, *"Belê, pîrsa Kurdistanê ev e..."*

(Roja Nû, hejmar: 43, 44, 46, rûpel:1, 1, 1, 1944)

(1, 2) Cegerxwîn, Folklorê Kurdî, rûpel: 44, 87

(3) Hawar, hejmar:8, rûpel:2

*Dîrok, muzîk û gel***Muzîka Kurdî dîroka gelê Kurd a devkî ye****Ferec Kurêşivan**

Dîroka Kurdan heya roja îro, bi metodeke zanistî nehatiye nivisandin. Yanî dîroka gelê me, ne niviskî ye. Bi gotineke din dîroka Kurdan di naveroka dîroka neyar de cih girîye. Dema ku em tê de ne dîrok ji nû ve tê nivisandin. Ango dîroka neteweya Kurd nû dibe, weke ya xelkê. Mirov kare bibêje gel bi dîroka xwe dikeve nav civakan. Ji aliyê din ve, dîroka gelê Kurd ji alî neyarê wî ve hatiye nivisandin. Dîrokvanê Îngilîz Arnold Toynbee, di wî warî de wiha dibêje: "Ger dîroka gelekî ji aliyê neyarê mirov ve bê nivisandin, li hember wî gelî talûkeyeke pirr mezin heye." Ev gotina Toynbee ji bo gelê Kurd çiqas rast e. Eger dîroka mirov ji aliyê neyarê wî ve bê nivisandin, ew kes qet nikare li paşîya xwe binêre. Yanî ew kes nikare bi awayekî zanistî xwe rexne bike û rexnegirîya xwe bide.

NIVISANDINA DÎROKÊ

Dîroka mirov bi destê wî bê nivisandin, piştî wî jî pirr qewîn dibe. Mirov bi pî û bask jî dibe. Bi alîkariya dîrokê kes kare li paşeroja xwe binêre û bi wî awayî kare hîn bêhtir xwe nas bike û bide nasîn.

Neyarên kevneperest, yên dijminê neteweyan gelek zilm û zor li xelkê bindest kirine. Roja ku mirovati bi çînan ve du par bû, ew çax tehde û neheqî jî pirr zêde bûn. Çîna serdest ji xwe re dewlet ava kir û zilm û zor bi darê dewletê hîn pêşdetir bir. Dîroka mirovatiyê bi van mînakên tijî ye. Ev tiştên ku hatin jimartin, hemû ji bo Kurdan lê ye. Mîna gelan, Kurd jî li hember vê zilm, zor, neheqî û tehdeyê derketin. Bi

vî awayî gelek serhildan li dar xistin. Xwestin ku welatekî serbixwe ava bikin, murweteke azad bi pêş ve bibin. Lê di wî warî de berjewendiyên çîna serdest ketine talûkeyê. Ji ber vê yekê dewlet bi şûr û rim, bi tanq û top, bi firok û bombeyên kîmyewî hatiye ser gelê Kurd û vebirîn û qirkirin çekirine. Dîrokên gelê bindest û gelê Kurd bi van bûyeran tijî ne. Neyar nehiştîye gel dîroka bi wî awayî jî binivisîne. Tiştên ku mirov nikare pê li rûyê hev binêre, di dîrokên gelê bindest de hene. Weke tecawûz, gund û şewitandin, heywan kuştin. Bar kirin, naye hesab. Barkirin, bûye parçeyek ji jiyana gelê Kurd. Ev hemû tişt Tirk, Faris û Ereban anîne serê Kurdan. Tiştê ku nayê hiş û aqilê însanan, anîne serê gelê Kurd. Bi wî awayî di edebiyata Kurdî de 'Serpêhatîyan' cihê xwe girîye. Serpêhatî tiştê ku hatiye (anîne) serê mirov û gelê Kurd.

MUZÎK Û BERXWEDAN

Mirov ne xwediyê muzîk û berxwedan dîroka xwe be, ne xwediyê çanda xwe ye û nikare li murweteke gelî xwedî derkeve. Heta panzdeh salan berê, Kurd ne xwediyê van tiştan bûn. Girîng e mirov 'murwetek çandî' jî pêş ve bibe. Gel ji bo bibe neteweyeke hemdemî girîng e yekîtiyê çandî jî ava bike. Mirov kare dorfireha vê yekîtiyê bibe heya edebiyatê, muzîk, ziman û hwd.. Incecx gel hingê kare rê û ronahiyê ji xwe re fireh bike. Gava ku dewleta Tirk hebûn û çanda Kurdî qedexe kir, lê gel her tim di nava xwe de bi zimanê xwe peyivî, bi Kurdî zarokên xwe lorandin. Di vê qadê de lêkolîn çêbibe, wê bê xuyanîkirin ku, kok û bingeha muzîka Kurdî ji

loriyên zarokan hatiye bizirandin. Di muzîka Kurdî de li hember neyaran berxwedan ji vir dest pê kiriye. Govendên gelî jî hemû qedexe bûne, lê gel dîsa listine û bi govendan kêf xweşî û şadimendî bûne.

NEYNIKA DÎROKÊ

Muzîka Kurdî di pirr aliyan de bûye dîrok ji Kurdan re. Mirov kare bibêje muzîka Kurdî, dîroka gelê Kurdî ya devkî ye. Muzîka caz jî, ji reşikên barkirî derket, ku çûbûn Rojava ev derê di wan re çol û çepel e. Reşikan ji van çol û çepelan di hundirê muzîkê de dîroka xwe jî bi xwe re anîn. Li hêlekê çanda reşikan nemaze muzîk ji gelê Ewrûpayê bû bingehê kêf û şadiyê; li aliyê din Ewrûpa qerf û qotikê xwe bi van re derbas kirin. Li Ewrûpayê gelek hunermendê bi nav û deng ji muzîka caz gihîştin. Lê rastiyeke li ber çavan ev e ku, çanda reşikan ji aliyê çanda împeryalî ve hatiye pişaftin.

Ji bo Kurdan ev bûyer li ber çavan e. Li Ewrûpayê kesên me yî ji welatê xwe hatine qewirandin, muzîk û çanda xwe pêk tînin û şev, meş li dar dixînin û dikevin festîvalan. Gava ku Kurd li Ewrûpayê penaber bûn, rêz û kevneşopên xwe jî bi xwe re birin. Kurdan xwe ji van dûr ve nexistin û bingeha çandî li ser rêz û kevneşopên xwe pirr bi qewîn danîn. Bi wî awayî Kurd ji reşikan vediqetin.

Di dawiyê de mirov kare bi kurtayî wisa bibêje: Bi pirranî dîrokên gelên bindest êdî ji aliyê wan ve tê nivisandin; bi hindikayî jî gelê Kurd êdî bi xwe dîroka xwe dinivisîne. Ev hemû nirxên tînan standin, bi pêşengîya ya PKK'ê çêdibe û bi xwîna şehîdan...

Ji dora Gingimê* stranên evînê**Warê Çirê warê me ye**

Çi darekî di gelî da
Bişkov daye di serî da
Dil xweş e di heft salî da

Çiya nema min lê danî
Kanî nema min av jê anî
Kes nizane min kul û
merez ji ku hilanî

Evdilelî bêdar nabe
Koza berxo bêkar nawe

Warê Çirê warê me ye
Textê dorê doşirme ye
Keko were destê min,
Bavê kura Kêrsê
Dayîkê li hêviya me ye

Çi silava ber êvarê
Min şandiye koxê Bîngolê
Ser zînara
Tilî û pêçiyên kekê min
Wer zirav in mîna pelê
vê cixarê

Rêka Mûşê rê dikşîne
Keko qurban
Sola wî teng e
Nig diêşîne
Wextê bizivirî
Ser mêlê xwe da
Porê serê xwe.

XORTÊ DEST BI HINE

Min dayîk dîtî
Wek sosinê
Wek hîv û rojê
Wek şîlanê
Li ser deviyê

Ev dayîkên me ne
Li garanê, li bêriyê
Li deviyê, li tozê
Li şîn û şahiyê

Min dayîk dît
Li goristanê;
Agir dada
Pêşîr vekir
Qêriya û got:
"Lo lawo, lo birawo

Ez ne tîm ji şîva mîriya
Ne dirim xîra deriya
Tu kesera dilê min î
Tu agirê serê çiya
Tu xortê dest bi hine
Tu bûka ser bi xêlî
Lo şehîdo lo egîto
Lo xwedî welato
Hîmo ser bilindo
Gel we dinuquşîne
Ser kevir û adara
Ser pêl û guliyê dara..."

Min zîlam dîtî
Eşîr û şêx
Bi navê giran!
Bi ar, şan û şerêf
Ew bûn, ewê xayîn
Ewên diz, ewan û çavsor
Sîng û ber û namûsa xwe
Dijmin rakirin deşt û zozan

Ew û dijminê tewşo mewşo
Rûreşîya dîrokê
Ew û xayînen xwelî li seriya
Wan bêol û bêîmana

Dayîkên me!
Rûkê we wêje ye
Destê we çand
Dilê we zanist
Çavê we ronahî

Hûn in hûnê rih û can
Hûn dergûşên bêguman
We çav vekir
Reş li xwe kir

Wê kaniyê zelal
Wê deşt û zozan
Xwe bixemilînin
Wê dergûş û bûk
Pîr û kal bigrin dîlan

Wê jiyana nû were çiya de
Wê bidome bibe bingeh
Wê bibe ronahî
Gelê rûkê cîhanê re

Jêhat Gingim

* Gingim: Varto



Di muzîka Kurdî de ne tenê evîn û bengîlî tê honandin, bûyerên dîrokî jî, ji aliyê dengbêjan ve bi awayê klaman ve tê strandin.

Ji dîroka kêmneta û olên Kurdistanê cihû û cihûtî

Dr. Kemal Sîdo-Kurdaxî

Ji kîjan demê ve cihû hatibûn Kurdistanê û kengî cihûtî li wir belav bûbû? Heta roja îro mirov nikare bersiveke rast û dirust bide. Hinek dîrokzan guman dikin ku cihû yekemîn çar piştî sala 722 berî zayîna Îsa (BZ) hatibûn Kurdistanê. Di wê salê de Padîşahê Asûriyan Selmansarê V. (726-722) welatê Samariyan dagir kiribû û xelkê Îsraîlê koçber kiribû. Heke ku ji wê demê ve cihûyên pêşîn hatibûn Kurdistanê.

Di dawiya sedsalîya 19'an de, dema ku bîr û baweriyên "panîslamîzmê" bi firehî li Împaratoriya Osmanî belav dibûn, baxîşa (dilfirehî) olî ji kêmtir dibû. Jiyan bi hev re, di nav ol û neteweyên Kurdistanê de, ya ku bi sedsalan didomiya, hêdî hêdî ber bi dawiyê ve dihat. Ji ber vê yekê gelek cihû hîn di wê demê de ji Kurdistanê derdikevin. Her di wan salan de jî guftûgoya di nav cihûyan de li ser çûndina wan ji bo Filîstînê û avakirina ardaneke neteweyî her diçû xurtir dibû. Dibe ku ev jî duyemîn sedema derketina cihûyan ji Kurdistanê be. Lê li gor jêderên din, ên di nav destên min de, pîrriya cihûyan heta salên 1951 û 1952'yan li Kurdistanê ma bûn.

Dagirkirina Filîstînê ji aliyê Brîtaniya ve û bangnameya Bêlfor ya 1917'an, dibûn vewşek (têvedan), ku pîrriya cihû berê xwe bidin Filîstînê. Her di wan salan de jî dijsamîtiya cihanê bi firehî belav dibû.

Kêmbûna baxîşa olî li Kurdistanê, ne tenê ji ber ola îslamê bû; ola îslamê jî zû ve li Kurdistanê belav bûbû, lê dilfirehiya olî her berdeham bû. Sedema serekî, ya ku kiribû ev baxîşa bi sedsalan berdeham, biheje û di nav olên Kurdistanê de dijberî derkeve meydanê, dewleta Osmanî bi xwe bû. Li vir pêwist e bête gotin ku li dewleta Osmanî, berî pêdabûn û bihêzbûna panîslamîzmê, baxîşa olî hîmek ji hîmên civakî yê girîng bû. Lewma di sedsalên navîn de gelek cihû ji Îspaniyayê, piştî serketina xirîstiyanan, revîbûn û li herêmên Împaratoriya Osmanî bi cih bûbûn.

Gelo ma çî bûyerên teze pêk hatibûn, da ku baxîşa olî li Kurdistanê û seranserê dewleta Osmanî biheje? Piştî serketina gelê Yewnanî ya 1829'an Tirkan baştir fêm dikir ku, Osmanîzm nema dikare bibe bingehek, ku jiyan

■ Li vir pêwist e bête gotin ku, îro jî "cihad" li dijî tevgera Rizgariya Neteweya Kurd ji aliyê rejîmên Ereb, Faris û Tirk ve tê bangkirin. Mînakek; di destpêka 1987'an de karbidestên KTê bi şeweyekî neresmî "cihad" li dijî têkoşerên Kurdistana Bakur bang dan. (1) Bi van terawîzan (danberhevan) baş tête diyarkirin ku "dek û dolabên" dijminên azadiya Kurd her orjînal mane.

■ Li gor texmînan hejmara cihûyan li Kurdistanê, di sala 1916'an de bi kêmanî 50.000 kes bûn. Ji wan li wîlayeta Diyarbekirê 1500, li wîlayeta Wanê 5000 hebûn. (3) Li dawiya sedsala 19'an hejmara cihûyan tenê li herêma Hekarî digihîştê 5000'an û ew li şeş deverên wê herêmê belav dibûn: Li Elbaqê 1600, Gewerê 300, Nehriyê 200, Aşîta (Çel) 200, Amediyê 1900 û li Mehmûdiyê 500. (4) Beşê din li gund û bajarên başûr û rojhilatê Kurdistanê diman û hîç statîstîk li ser wan li ba me nîn in.

dewleta Osmanî li serê bidome; îdeolojiyê nû pêwist bû. Di Osmanîzmê de rola ola îslamî ewqas ne mezin bû. Piştî ku gelên xirîstiyaniya xwe ji bin sîtemkariya Tirkan azad kiribûn, pîrriya gelên Împaratoriya Osmanî, yê mayî misilman bûn. Ji ber vê yekê pêdakarî û bihêzkirina panîslamîzmê û panturkîzmê tiştêkî ponij (lojîk) bû.

PANİSLAMİZM

Di pêvajoya pêdabûna panîslamîzmê de rola "cihadê îslamî" roj bi roj mezintir dibû. Tiştê bi seyr ew e ku bangdana "cihadê îslamî ya giştî" di destpêka Cenga Cihanê ya Yekemîn de ne ji Stenbolê hat; ew jî Berlînê hatibû. Helbet ev pîrs hewceyî lêkolîneke taybetî ye. Em vegehin ser "cihana îslamî" bi xwe. Her gav, dema ku ji paytexta Osmanîyan "cihadê îslamî" dihat bangkirin, pêwendî di nav misilman û nemisilmanên Kurdistanê de didixîzîn. Li hin deverên Kurdistanê, li yê ku şerokeşîr û axa zêde olperest bûn û nêzikî Osmanîyan bûn, jiyan di nav cîranên misilman û nemisilman de gelek dijwar dibû. Xelkê nemisilmanan wek "gawir" dihatin nîrxandin û her wiha çirkirina wan dihat "helalkirin". Helbet pîrriya cihanê misilman jî, yê ku serî li dijî "emîr al-mu'mînîn" (mîrê bawermendan) hil didan, wek "gawir" dihatin nîrxandin û fermana serjêkirina wan jî, ji sultanê Osmanî dihat.

LI DIJÎ TEVGERA RIZGARIYÊ CIHAD

Li vir pêwist e bête gotin, ku îro jî "cihad" li dijî tevgera Rizgariya Neteweya Kurd ji aliyê rejîmên Ereb, Faris û Tirk ve tê bangkirin. Mînakek; di destpêka 1987'an de karbidestên KTê bi şeweyekî neresmî "cihad" li dijî têkoşerên Kurdistana Bakur bang dan.

(1) Bi van terawîzan (danberhevan) baş tête diyarkirin ku "dek û dolabên" dijminên azadiya Kurd her orjînal mane.

Inca diyar dibe ku ûştên (sedem) kêmbûna baxîşa olî li Kurdistanê bêhtir ji derveyî civaka Kurd hatine. Lê li Kurdistanê, ji ber paşketiya civakê, zevî ji bîbaxîşa olî re her amade bû.

Bi vî awayî derketina cihûyan ji Kurdistanê, ji ber du ûştên serekî bûn: Yek, bihêzbûna bîra avakirina ardaneke neteweyî; didu, kêmbûna baxîşa olî.

Gelo ma hejmara cihûyan li Kurdistanê heta dawiya 1918'an çiqas bû û ew li kîjan bajarê diman? Her çiqas di çavkaniyan de hin agahî hene, dîsa jî bersivdana vê pîrsê, wek hemû pîrsên statîstîkî yê din li Kurdistanê, ne hêsan e. Ji pirtûka Îsmet Şerîf Wanlî, "Kurdistan û Kurd", diyar dibe ku Kurdnasa Firansî Joyce Blau kesê pêşî bûye, ya ku li ser cihûyên Kurdistanê nivîsiye (2). J. Blau bala xwe bêhtir daye ser cihûyên Kurdistanê ji sedsala 12'an û bi şûn ve. Lê li ser hejmara wan, wekî ku ji min re diyar bûye, J. Blau ne-nivîsandîye. Min pîrriya hewl da ku ez gotara J. Blau "Les Juifs an Kurdistan" bi dest bixim. Lê min nikaribû ew peyde bikira. Dê gelekî baş be, eger ew gotar ji bo zimanê Kurdî bête wergerandin.

HEJMARA CIHÛYAN LI KURDISTANÊ

Li gor texmînan hejmara cihûyan li Kurdistanê, di sala 1916'an de bi kêmanî 50.000 kes bûn. Ji wan li wîlayeta Diyarbekirê 1500, li wîlayeta Wanê 5000 hebûn. (3) Li dawiya sedsala 19'an hejmara cihûyan tenê li herêma Hekarî digihîştê 5000'an û ew li şeş deverên wê herêmê belav dibûn: Li Elbaqê 1600, Gewerê 300, Nehriyê 200, Aşîta (Çel) 200,

Amediyê 1900 û li Mehmûdiyê 500. (4) Beşê din li gund û bajarên başûr û rojhilatê Kurdistanê diman û hîç statîstîk li ser wan li ba me nîn in.

Piştî Cenga Cihanê ya Yekemîn gelek cihû ji bakurê Kurdistanê ber bi Filîstînê, Ewrûpa û başûrê Kurdistanê ve koç kirin.

Tête zanîn ku heta salên 1950-51'an li bajarên wek Zaxo, Dihok, Hewlêr û Silêmaniyê hejmareke mezin ji cihûyan hebû. Li gor J. Blau cihûyên wan deveran ne tenê bazirgan û destkarvan bûn, lê belê cotyar û xwedî zewî bûn jî. (5) Wan cihûyan di nav xwe de bi zimanê Kurdî dipeyvîn; zimanê Îbranî tenê li kîniştê (derên cihûyan) dihat bikaranîn.

Her çend dijsamîtiya di rîya panîslamîzmê û di rîya neteweperestiya Ereb, Faris û Tirk re derbasî Kurdistanê jî bûbû, belam di zeviya civaka Kurdan de reh bernedabûn. Di nav Kurdan de, cihû wek mirovên rast û durist û xwedîsoz dihatin nasîn. Ji aliyê din ve, pêwendiyên Kurd û cihûyan di dîrokê de her baş bûn û Kurd ji demeke dûr ve bi baxîşa olî navdar bûn. Wek dîrokzanê Îsraîlî Elî Rotşîld dinivîse, piştî sala 1185'an, dema ku mîrê Kurdan Selaheddîn Filîstîn girtibû, hêviyê mezin li ba cihûyên Rojhilatê û Ewrûpayê peyde bûbû. Her di wê demê de hinek komên cihûyan hatibûn Filîstînê. E. Rotşîld dibêje, ku di wê demê de jî deriyên gelek kîniştîyên cihûyan vebûbûn û cihûyan dikaribûn bi azadî jiyanê xwe ya olî bidomînin. (7)

Wek min li jor gotibû, heta destpêka sedsala 19'an baxîşa olî li Kurdistanê her xurt bû. Yanê ta ku mîrnişînên Kurd xurt, xwedî deshilat û darmend bûn, di nav xelkê Kurdistanê yê pîr olî de, pêwendî bi şeweyekî giştî baş bû. Tenê piştî ku Kurd bi temami

bi dewleta Osmanî ve hatibûn girêdan, di nav xelkê de "dijmîntiya olî" dest pê dikir. Armanca Tirkan ew bû ku xwennaskirina neteweyiya Kurd bi şûn ve bi xînin û rê li berê bigirin. Lewre tête diyarkirin ku, di eynî demê de di gel cihûyan û hin nemisilmanên din jî, ji Kurdistanê derdikevin.

Zûtirîn kesên ji cihûyên şerqî, yê çûbûn Filîstînê, cihûyên Kurdistanê bûn. Hîn di destpêka sedsala 19'an de gelek cihû hatibûn Filîstînê. Wek J. Blau dinivîse, di 1926'an de nêzikî 2000 cihûyên "Kurdîman" li Filîstînê hebûn. Ew texmîn dike ku îro hejmara cihûyên "Kurdîman" 90.000 kes in. J. Blau dinivîse: Heta roja îro ew di bin bandora folklorê Kurdan de mane û gelek çaran ew cihû şahiyên xwe bi def, dehol û zirne derbas dikin. Ji sala 1975'an ve komeleye wan jî heye. Cihûyên "Kurdîman" her sal li payîzê derdikevin seyranê" (6)

TEŞBÎHA ÎSRAÎL

Li dawiya vê gotarê hewce ye mirov çend gotinên din jî bibêje. Piştî avakirina dewleta Îsraîl di 14.5.1948'an de, karbidestên şovenîst û nîjadperest, yê Ereb, Fars û Tirk herdem Kurd û Kurdistanê wek nokerên Îsraîlê dinixînin. Herwekî tu bîngeh jî, ji van azaran (tuhme) re nîn e jî, dîsa jî gelek çaran ji Kurdan re "Îsraîl as-saniye", "Îsraîlê duyem" û "Îkincî Îsraîl" tête gotin. Her çiqas Tevgera Azadîxwaza Kurd her dem piştgiyariya mafên gelê Filîstînî kiriye û di vê pîrsgirêkê de her dem aligirê çarelêkirineke aşî, demokrat û dadmend bûye, tiştê din yê seyr ew e ku, dagirkerên Kurdistanê dema dikevin tengayan bi xwe diçin Îsraîlê û daxwaza alikariyê li dijî Kurdan dikin. Lê hema cihû weke me Kurdan ne xerşim û ew dijminan wek dost nabînin û nedijminan nakin dijmin.

Jêder

1. 2000'e Doğru, Nr.1, 1987.
2. İsmet Çerif Vanly, Kurdistan und die Kurden, Göttingen 1988, Band 3. (Almanî)
3. Gabriele Yonan, Ein vergessener Holocaust; die Vernichtung der Assyrer in der Türkei, Göttingen 1989, rûpel 267 (Almanî)
4. Her di wir de, r. 211
5. İ. Çerif Vanly, r. 33-34
6. Her di wir de, r. 34
7. Elî Rotşîld, die Juden und das Heilige Land, 1967, r. 28-30 (Almanî)

Ehmed Dawûde: Meyjenê navdar ê gelê me

Hevalbend û hevtemenê E. Dawûde, Mam Cewher dide zanîn ka çawa û ji kê E. Dawûde fêrî lédana vî ambûrî bûye. Mam Cewher wiha dibêje: "Bapîrê wî Alî Nadîrê Neyjen bû, di warê meyjeniyê de mîna wî kê mîna bûn. Ez bawer dikim, Ehmed Dawûde ji bapîrê xwe fêrî lédana vî ambûrî bûbû. Bapîrê vî li dora salên 1940'an koçber kir. Ez bi xwe hîn zarok bûm, Ehmed Dawûde bi xwe qamişên meyê çêdikir."

Pismam

Êla Dawûde ku li dor barê bajarê Kerkûkê niştêcih bûye, di warê huner û muzîkê de gelek xizmet gihandiye çanda gelê me. Û di wî warî de bandora wan baş dixuye. Maqamnasê Kurd **Heme Dirêj** dibêje: "Em hîn zarok bûn, di 1930'yan de **Salih Dawûde** mamê Sileh Dawûde yê** stranbêj, ambûra meyê zehf xweş lê dixist û di civatên şevan de, di gel hemû pîrbûna xwe bi meya xwe li meqemê qeter*** dida." Bi vê gotinê dide xuyan ku Dawûdeyan, bi resen di warê muzîkê de jî berê ve ghiştî ne.

Yek ji meyjenên bi nav û deng î gelê Kurd **Ehmed Dawûde** ye, ku dîroka muzîka Kurdî bi şanazî cih dide navê wî. **Cewher Rizo Çawîşê** ku nêzî 25 salan di gel wî li dahul û tapilê (darbûqê) da bû, der heqê wî de wiha dibêje: "Rehmetî, heke biçûya ku derê, bêyî min nedîçû. Mala wan di gundên Dawûdeyan de bû, lê dema ku min ev nas kir, mala wan li Duzxurmato, li **Taxa Yenîdamler** (Xaniyennû) bû, pişt re jî mala xwe anîne Taxa Şorîcêyê li bajarê Kerkûkê." Mam Cewher wiha dom dike: "Di gel wî pîrî caran li Bexdayê, Silêmanî, Çemçemal, Qerehesen û gundên der dorê wan em vexwendî-



Ehmed Dawûde bi meya xwe xizmeteke mezin bi hunera Kurdî kir

bûn. Her wiha li govendên bajarê Kerkûk û derdorê wê gelek stranbêj beşdarî me dibûn. Wek; **H. Alî, Salih û Faîk Dawûde, Şakir Xeyad, Sebîr Kurdistanî, Kerîm Xemzeyî** û hwd."

Hevalbend û hevtemenê E. Dawûde, Mam Cewher dide zanîn ka çawa û ji kê E. Dawûde fêrî lédana vî ambûrî bûye. Mam Cewher wiha dibêje: "Bapîrê wî **Alî Nadîrê Neyjen** bû, di warê meyjeniyê de mîna wî kê mîna bûn. Ez bawer dikim, Ehmed Dawûde ji bapîrê xwe fêrî lédana vî ambûrî bûbû. Bapîrê vî li dora salên 1940'an koçber kir. Ez bi xwe hîn zarok bûm, Ehmed Dawûde bi xwe qamişên meyê çêdikir." Bi baweriya pîrî kesan heta niha kesekî ku karibê di wî warî de cihê wî tije bike, li Başûr derneketiye. Hin dibêjin, sedsalê din jî meyjenekî wek wî dernakeve. Ji ber ku Ehmed Dawûde meyjenekî jêhatî û şareza bû. Bi hemû cureyên govend, beste, meqam û stranan dizanibû, şarezayê ghiştî yê hemû meqamên navçeyên Germiyan bû.

Kurê mezin ê Dawûde

Newzat dibêje: "Rehmetî bavê min, di dema xwe de di gel stranbêjê nemir **Alî Merdan**, li Ehmed Dawûde di gel meyê lê xistibû. Mala wî **Mamoste Tahîr Tewfiq, Hesên Zîrek**, pîrî kesan kar kiribû."

Silav li giyanê pîroz yê Ehmed Dawûde yê hunermend û dengê zelal ê meya wî.

Perawêz:

* **Heme Dirêj:** Meqambêjê şareza û bi nav û deng û bajariyê Kerkûkê bû. Çend salan berî vê, çû ser heqîya xwe.

** **Sileh Dawûde:** Meqamnas û stranbêjekî bi nav û deng û şareza yê hemû cure meqamên Germiyan e. Tenê hunermendekî ji Êla Dawûdeyan ku, hin li jiyane ye. Niha li bajarê Kerkûkê dijî.

*** **Qeter:** Cureyek jî meqamê Germiyan e ku pîrî zore û her hunermend nikare bibêje.

Têbinî: Sûd ji pirtûka ambûrên muzîka Kurdî **-Wirya Ehmed-** hatiye girtin.

Werger ji Kurmanciya jêrin: S. Berbang - Pismam

Ji Tirkekî re

Ger tu tenbûra xwe bînî
Ji min re sazên bixwînî
Li ser evîne..
Ezê guhdarî bikim
Sazê te ji ber bikim
Ji te re
Sazekî bibêjim li ser
Mem û Zîne...!

Lê eger
Tu tivingê hilgirî
Dil ji kîne dagirî
Werî hêlinên çivîkan hilweşînî
Kaniyên me biçikînî
Tu biharê ji çiyayên me'y bilind

birevînî

Bi nenûkan
Ezê rûyê te birîn kim
Bi diranan
Damarên dilên te biqetînim
Te li ser darbestekê
Li diya te veqetînim

Ev dila
Weke çawa
Mişt evîna niştîman e
Her wiha
Mişt ji kîna dijminan e.
Ezê vî dilî
Yê ji ber arê evînan...
Vî welatî dikelî
Dê bikim bombe li ser
Biteqînim

Ger tu nêzîkî çiyayê min bibî
Ezê pozê te di nav axê bidim
Ezê wê hîv û stêra
Ku li ser eniya te ne
Bikişînim
Û li ser
Kêlegora te ya mermer
Bineqîşînim
Bere dayîka te li benda te bimîne
Ta hebe
Nema car din te bibîne
Wek çawa dayîkên me
Hêsirên germ dirijînin
Bere dayîka te jî hêsrâ
Birijîne.
Da bizanin (yên tu şandin van deran)
Ev çiyayên ser li nav hîv û stêran
Ji wan re gorin û hêlin in ji bo
Partîzan û xurtemêran.

Jan DOST

Efsaneyek le Erîtîrya

Zirdayikêkî rezagiran

Hebû nebû xanewadeyek hebû le bawkekû dû kiç pêk hatibû. Dayikeke emrî xuday becê geyandbû. Bawkekeş jinêkî tirî hênabû û pêkewe zemawendiyana sazki dibû. Bawkeke zor-bey kat le malda nebû katê ew le malda nebû zirdayikî kiçekan zor rezagiran û êsikgiran bû berameber be minalekan û xwardiniyan teniya xorakî kon û bermawe bû. Zirdayikeke xorakî be tam û çêj û cilki ciwanî deda be herdû minale heqekanî xoy.

Rojêk le rojan satêk piyawe-ke gerayewe malê çawî bew çêste xoşe kewt ke jineke amadey kirdibû, tumez bo ewey dilî piyaweke şad bikat. Lew kateda piyaweke be jiney gut:

- Jine xoşewîste kem, to natwanî her rojêk çêştî wa xoş lê binêy? Jineş le weramda gutî:

Detwanim

Bêguman.. bêguman:

Le nîweşewda karê kiçekan rakîşabûn û razabûn, bawkeyan hat û ewanî le xew raperand û pê gutin.

- Be piyase kemê deçîne derewe û degerêyîn-minalekanîş sad bûn û gutiyan:

Be piyase

- Belê!

Hemûyan pêkewe milî rêgayan grit, herçî bawkeşe bîrî ewey kirdbowe ke minalekanî le daristan becê bihêlêt. Katê qederekî dirêj royiştin lenêw darekanda geyiştine cêgeyek ke gelê ajelî dirinde û kêwî lê hebûn, çunke minalekan taqetîyan leber birabû û şeket bûbûn bawkiyan gutî:

- Wa direng dahat detwanî

Herçî xuşke gêlokeke bû deywîst rêga tari-keke bigrête ber, belam ewî zîrekeke deywîst rêga roşineke bigrête ber. Le kotayîda biryariyan da rêga roşineke bigirne ber. Ewan royiştin û royiştin ta tûşiyân hat be tûşî piyawêk, piyaweş ew şwêney pê gutin ke şarêkî lê helkewti bû katê geyiştine şareke yekser destiyân kird be kar kirdin. Zor zû dewlemend bûn û şûyan kird û bûne xawenî minalî xoyan.

lejêr em direxteda xoman dirêj bikeyin û bixewîn. Le akamda heryek lewan xoyan lemle û lewlay bawkiyan le jêr dirextedekda dirêj kird. Belam katê minalekan xewyan lê kewt bawkiyan bizir bû û kiçekanî xoy becê hêşt.

Yekê li kiçekan zîrek bû û ewî dîkeş nefam û gêloke, katê le xew rabûn, kiçe nefameke gutî:

- Babe... babe le xew rabe!

Belem kiçe zîrekeke gutî!

- Rabe emey cê hêşt.

Herçî kiçe nefamekeş bû bawerî bem şite nedekird û deygut:

- Nexêr, babe lêreye.

Wextê biwe beyanî herdû kiçeke dû rêgayan le berdem xo bedî dekird takû bitwanî pâyda biron, rêgavakiyan roşin bû û ewî tiryan tarîk, kiçe zîrekeke le xuşke gêlokekey pirsî:

- Kame rêge bigirne ber? Rêga roşineke ya tarikeke?

Herçî xuşke gêlokeke bû deywîst rêga tarikeke bigrête ber, belam ewî zîrekeke deywîst rêga roşineke bigrête ber. Le kotayîda biryariyan da rêga roşineke bigirne ber. Ewan ro-

yiştin û royiştin ta tûşiyân hat be tûşî piyawêk, piyaweş ew şwêney pê gutin ke şarêkî lê helkewti bû katê geyiştine şareke yekser destiyân kird be kar kirdin. Zor zû dewlemend bûn û şûyan kird û bûne xawenî minalî xoyan.

Herçî bawkeke û zirdayikeke û minalekanîyê tûşî hejarî û nedarî hatin û naçar bûn dest pan bikenewe û deroze biken. Rojê le rojan bawki em dû xuşkane rûy kirde ew şarey ke ewanî lê dewiyan. Bawkeke he-ta destî le kiçekanî xoyşî pan kirdewe û daway yarmetî lê kirdin, belam ewanî nenasiyewe-xuşke nefame ke deywîst bilêt:

- Ême kiçekanî toyin.

Belam herçî xuşke zîrekeke bu deywîst hefteyek çaweriwan bikat.

Katêk bawkeke bo mawey hefteyek lay kiçekanî mayewe û lewê jiya xuşke zîrekeke pirsî:

- Çi minal şik nabey?

Lew kateda bawke kewte gêranewey beserhatekey xoy ke dû kiçî hebwe û le daristanda bo ajele dirinde û kêwiyekani becê hêştin.



Le Somalij mindelekan wek Erîtîrya bîrsîne

Le kotayîda ke hal û mesele aşkira bûn bawke ta mirdinîş her legel kiçekanî xoyda jiya.

Pêşinan gutûyane:

Bebê dayîk malî rasteqîne çî bûnêkî niye.

Zirdayîk hemîşe wek mey-munêk waye.

Têbînî:

Em efsaneyek le demî kiçe Erîtîryayî Saba maharî wergîrawe û le govarî (NY I SVERIGE) y Swêdi jimare 6/1989 bilaw kirawete we hu bê destkarî kirdin kirawete Kurdî.

Wergêranî le Swêdi Mehabad Kurdî

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1- Şoreşgerekî Frensiz e û di sedsala 18. de jiyaye. Di pêkanîna Şoreşa 1789'an roleke girîng listiye. Di destpêka Şoreşê de dibê endamê parlamentoyê dû re gav bi gav ber bi iktîdarê ve dibeze. Dawî iktîdarê dixê destê xwe, bes di 1794'an de ji aliyê Robespierre ve tê gijotînkirin/ Kes an jî tiştê bi saziyekê, bi organekê ve girêdayî 2-Rêxistina siyasî ya ku ji bo rizgariya Îrlandayê têdikoşe/ Berevajiyê kevin/ Kesê ku dirûtina kincan ji xwe re kirîye meslek 3-Gotina nanayî/ Cih an jî devera ku rê dibê dudo 4-Navê kovareke ku mafê gelê Laz diparêze û li Tirkiyeyê derdikeve/ Li ser 5-Zanista li ser sewalan/ Têjika gamêşê 6-Bi Tirkî hejmarahî/ Germahiya laş ya ku di dema nexweşîyê de derdikeve (berevajî)/ Cînavka yekemîn a pirrehejmar 7-Yezdanê Evînê 8-Kesê ji Amedê 9-Dem, wext/ Agir 10-Navekî din ê Okyanûsa Atlasê

Serejêr: 1-Navê jîndarekî ku nijada wî qeliyaye/ Qesela hûrkirî 2-Navê helbestvanekî Fransîz ê ku di sedsala bîstemîn de jiyaye û bi helbestên xwe yê ji bo Elsa hatine nivîsin, êdî zehf tê naskirin/ Di sedrencê de gotina ku dawî li lîstikê tîne 3-Berevajiyê erê/ Kurtnivîsa numro/ Herfên ku peryên Tirkiyeyê nîşan didin 4-Navekî jinan 5-Kurtnivîsa Rêxistina Yekîtiya Neteweyan (bi Îngilîzî)/ Ewrûpî ji Osmanîyan re dibêjin 6-Newroz/ Hişk 7-Îşaret 8-Kesê ku etariyê dike/ Di milê

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

mirov de cihê tewanekê 9-Kesê ku nayê naskirin, meçhûl 10-Kurtiya doktor/ Kûçik 11-Li Amerîkaya Başûr navê şaristaniyeye beriya Mîladê 12-Di muzîkê de notaya sêyemîn.

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Marîvaux/ Pap 2-Ol/ Afîna 3-Lidarketin 4-Îm/ Rûmetî 5-Awe/ Ena/ Ez 6-Ref/ Ken 7-Eman/ Nz 8-Atarî 9-Ar/ Ta/ Êş 10-Vegotin

Serejêr: 1-Molîere/ Av 2-Alim/ Emare 3-Afat 4-Nato 5-Virrek/ Rat 6-Enî 7-Erenz/ Ên 8-Xatûn/ Îş 9-Tima 10-Pîne 11-An/ Te 12- Payîz

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Mazhar Günbat

İş Bankası Çağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkiyê: Mazhar Günbat

İş Bankası Çağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay

Apt. No:5 Daire No:14 Çağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	120.000	50 DM
6 meh	240.000	100 DM
12 meh	480.000	200 DM

Welatên dewlemend, ku ji aliyê aborî û leşkerî ve pîrr xurt in, welatên feqîr û li paşmayî bi xwe ve girê didin, wan dikin metingeh. Mêtingehkar li metingeh zilmê dikin, zimanê wan qedexê dikin, dîroka wan winda dikin, didin jibîrkirinê, nahêlin ku li ser dîroka wî gelî lêkolîn bê çêkin. Ji bo pêşveçûna ziman, astengên mezin derdixin holê. Rewşa aboriya wî welatî metingeh xerab dikin. Tiştên dewlemend (zêr, maden, petrol û hwd) ên welatê bîndest bîndest dikin, dikişînin welatê xwe.

Li welatê metingeh, gelê wî welatî, li dijî dagirkeran têkoşînê dide. Ji bo ku welatê xwe rizgar bike, gelê xwe azad bike, di mercên zor û zehmet de şerekî bêhempa dimeşîne. Di welatên metingeh de gel, yekîtiya xwe ya neteweyî çêdike û di rêveçûna azadî û serxwebûnê de dimeşe.

Di şerê rizgariya neteweyî de hemû çîn û tebeqeyên ku li dijî metingehkar in, cihê xwe digirin Karker, gundî, ronakbîr (rewşenbîr), burjûvaziyê biçûk û yê milî û hwd. bi hev re di nav eniyekê (cephe) de cih digirin û şerekî bêhempa li dijî metingehkaran dimeşînin. Hetanî ku bi ser Kevin. Di şerê rizgariya neteweyî de rola jinan, ciwanan û zarokan pîrr girîng e. Niha ezê li ser rola zarokan çend gotinan bibêjim.

Di şerê rizgariyê de zarok bi her awayî ji gel re dibin alîkar. Piştî bav û birayên xwe yê mezin digirin. Li dijî dagirkeriyê bi bav û diya xwe re, di qada têkoşînê de cih digirin. Di xwepêşandan de dimeşin. Bi kevîran êrişî ser polîs û leşkerên dijmin dikin, kevîran diavêjin wan, çêran ji wan re dikin.

Di welatên metingeh ên Filîstîn û Kurdistanê de zarok roleke mezin di têkoşînê de dileyîzin. Zarokên gundîyan nêr dibin, li çiya didin şerkerên azadîxwaz, gerilayan. Zarok saloxgeriyê jî digerin, der heqê qeweta dijmin de saloxan didin gerilayan, hejmara leşkerê dijmin ên wê herêmê ji gerilayan re dibêjin. Û di nav hêzên gerilayan de mesajan dibin û tînin.

GENERALÊN BIÇÛK

Welatê Filîstîniyan wek Kurdistanê metingeh e. Filîstîni jî wek Kurdan ji heqê xwe yê demokratîk û nete-

weyî bêpar in. Ê wan jî wek Kurdan dewleta wan tune ye. Îsraîliyan welatê wan kiriye mêtîngêh. Filîstîni li dijî Îsraîlê şerê rizgariya neteweyî didin. Di sala 1989'an de gelê Filîstîni li dijî dagirkerên Îsraîlî ser hildan. Bi çovan û kevîran êrişî ser leşkerên Îsraîl kir-

nameyan di nivîsên xwe de ji bo zarokên biçûk ên Filîstîniyan digotin "Generalên biçûk". Bi rastî jî ew generalên biçûk bûn û artêşa (ordiya) zarokan li dijî artêşa mêtîngehkaran şer dikir. Generalên mezin ên artêşa Îsraîl, li ber generalên biçûk hatibûn el e-

timên taybetî û jendirmeyan kirin, kevîr avêtin wan, serê wan dagirkeran şikandin.

Zarokan got: "Yan Kurdistan, yan neman", "Bijî Kurd û Kurdistan"

Zarokan gava ev slogan diavêtin, polîs û leşkerên Tirk har dibûn, berê çekên xwe, tîfingên xwe didan jin,

yan e, serhildan jiyan e, Lêxe gerîla lêxe, dagirkeran pêxe".

Di serhildana navçeya Cizîrê, Nisêbinê û Licê de zarokan pîrr sloganên cur be cur avêtibûn. Polîs û leşkerên Tirk ji xwe re şaş û ecêp mabûn. Serbazê Tirk ji rojnamevanekî re gotibû: "Ev zarok, ev slogan ji ku hîn bûne. Kurd û Kurdistan ji devê wan nakeve. Zarok hemû di biçûkiya xwe de bûne Kurdperwer."

ZAROK

DAHATUYA GEL IN

Di şerê rizgariya neteweyî de zarok pîrr zehmetê dikişînin. Têr kuştin, birîndar dibin. Jendirme û polîs wan digirin, li wan dixin, bi wan îşkenceyê dikin, digirin, dipirsin: "Ka bavê te, an birayê te, xwe li ku veşartine. Ji me re bibêje?"

Li Tirkiyê piştî ku di 12'ê Îlonê de cuntaya faşîst a leşkerî hat ser hikum, pîrrê şoreşgerên Tirk û Kurd girtin, bi wan îşkence kirin. Hinek şoreşgerên ku xeber nedabûn, neaxiviyabûn, jin û zarokên wan girtibûn anîbûn li ber wan bi wan îşkence dikirin. Lêdana pîrr jî zarokan dixwarin. Polîs ji bo ku "dilê bavê bi kur an keça wî bişewite û xeber bide" pîrr li zarokan îşkence dikirin.

Zarok, pêşeroja gel in, hêviya pêşerojê ne. Ev tişt jî bo her neteweyî wisa ye. Di her civakê de cihê zarokan û qedr û qîmeta wan bilind e. Di welatên bîndest de zarok bi rastî jî zarokiya xwe najîn. Jiyandina zarokan bi hezar zehmetî ve girêdayî ye.

Ji bo ku zarok jiyaneke baş û xweş bijîn, divê welatê wan rizgarkirî bibe, gelê wan azad û serbixwe bibe, di nav civakê de sazûmaneke demokratîk hebe.

Jiyana zarokên ji neteweyên bîndest û yê serdest ne wek hev in. Zarokên neteweyên serdest wek zarokên neteweyên bîndest zehmetiyên nakişînin. Ji bo vê yekê jî wezîfeyên zarokên neteweya bîndest zêde ne. Zarok ji zarokiya xwe pê ve hîmê zanyariyê digirin. Gava zarok ji biçûkiya xwe pê ve hay ji doza neteweya xwe û welatê xwe hebin, bi evîna welatperweriyê bigihin û bi evîndariya gel mezin bibin, bi her awayî dibin hêviya dahatuya gelê xwe.

Lokman Polat



Di têkoşîna rizgariya neteweyî de rola zarokan

Generalên biçûk



rin. Di serhildana Filîstîniyan de zarokan roleke pîrr mezin û girîng leyîst.

Zarokan di kuçeyan de kevîr avêtin leşker û polîsan, dîrûşme (slogan) avêtin, ala Filîstîni bilind kirin, meşîyan, kirin qîre qîr û gotin: "Leşkerên dagirker ji welatê me herin der. Bimre mêtîngehkarî, bijî Filîstîn."

Hemû rojname, radyo û TV'yên cihanê qala serhildana Filîstîni û rola zarokan kirin. Wêneyê zarokan di rojnameyan de derketin, kevîr di destê wan de, diavêtin leşkerên Îsraîlê. Ji bo vê yekê, ew gav hemû roj-

manê. Bi wan biçûkan re serîder nedikirin.

DI KURDISTANÊ DE GENERALÊN BIÇÛK

Salek piştî serhildanên Filîstîni, vêca li welatê me Kurdistanê meş, berxwedan û serhildanên gel ên mezin çêbûn. Di navçe û bajarên Kurdistanê de, gelê Kurd; jin, mêr, kal, xort û zarok bi hev re li dijî dewleta Tirk serî hildan. Ketin nav kuçeyên sîkan û meşîyan. Li dijî dagirkerên Tirk dengê xwe bilind kirin. Di serhildana gelê Kurd de zarokan serî kişandin. Zarokan êrişî ser polîs,

mêr û zarokan û ew didan ber gulleyan. Di serhildana gelê Kurd a navçeya Licê de leşkerên Tirkan zarokên xistin binê panzerê û ew pelixandin. Di serhildana Licê de yek jî jinek, hate kuştin. Ew zarok û jin bûn şehîdên nemir ên Kurd û Kurdistanê.

Zilm û zordariya dewleta Tirk pêşiya têkoşîna rizgariya gelê Kurd nikare bigire. Gelê Kurd bi girseyî dimeşe, nalet li vî zilmê tîne, li dijî mijokdariyê serî hildide. Zarokên Kurd ên biçûk jî di qada têkoşînê de cihê xwe digirin, li dijî zilmkaran diqîrin, dibêjin: "Berxwedan ji-

Li gor gotinan, li bajarê Stenbolê 3 milyon Kurd dijîn. Ev Kurdên li metropolê dijîn rewşa wan çawa ye, çi dikin, çawa dijîn, jiyana wan a malê çawa ye, bi teybetî li kîjan taxan dijîn? Bi çi sedemê ji welatê xwe dûr ketine û çi hevî dikirin, çi ditin? Bi van sedeman me ji xwest ku vê hefteyê, ji bo xwendevanên rojnameya Welat, ji jiyana çend malbatên Kurd hin 'wênayan' pêşkêşî we bikin.

Li bajarê Stenbolê navçeya Gaziosmanpaşayê, Taxa Küçükköyê li gorî tê texmîn kirin kesên lê dijîn %60 Kurd in. Kurdên li Stenbolê dijîn, tenê ne li Taxa Küçükköyê ku li keviya bajêr dikeve nîştêcih bûne, gelek taxên din jî ku li guhê bajêr dikevin, bûne warê Kurdan.

Kurd ji ber çi li perrên bajêr dixwazin rûnên? Me ev pirs ji mala pêşî ku em çûnê, pirsî. Xwediyê malê Evdilselam wiha got: "Ez bi xwe ev pênc sal e ku li vê taxê rûdinê. Wexta ku nas û dostê me ji Kurdistanê tên, ewil çavên wan li navenda bajêr e. Lê, ji ber ku zû hîni jiyana bajartiyê nabin, îca çavên xwe li keviya bajêr li xaniya digerin. Tiştêkê din jî, zarok di nava bajêr de gelek zû fêrî tiştên xerab dibin. Qet nebe li keviya bajarê zêde cihê pîstahiyê tune ye."

Koçberbûn û bi dû re ji nîştêcihbûna Kurdan li bajarên mezin, bi gelek sedeman ve tên girêdan. Hinek ji ber rewşa aborî, hinek ji ber rewşa siyasî û hinek jî, ji ber neyartiyê dest ji welatê xwe berdane û jiyana xwe li metropolan didomînin. Mala ku em lê bûne mêvan nasê me bû, piştî ku me kêfxweşî li hev da, me armanca xwe ji wan re got. Xwediyê malê hinek teredût kir; ku me jê re got: "Hûnê têkevin rojnameyê." Got: "Îca rojnameya Kurdî, ne va ye em lê baş bi zîmanê xwe nizanin. Qey me ev heq kiriye?" Me ji wî re got: "Kekê min, emê tenê ne bi malbata we re bipeyivin. Emê li ser rewşa Kurdên li Stenbolê lêpirsinekê çêbikin." Evdilselam hengê got: "Li ser çavan." Lawikek kete hundir, kincên xwendekaran lê bûn. Me pirsî ka ev kî ye? Evdilselam got: "Kurê min e." Lawik hat xêrhatinî li me kir û li ba da me rûnişt. Me navê wî jê pirsî, got: "Navê min Huseyn e."

-Huseyn tu çend salî yî? Hinek sekînî û got: "Anlamadim (min fêrî nekir)" ku bavê wî jê re got: "Lawo tu çend salî yî?" Huseyn serê xwe hejand û got: "Witî... Ez 9 salî me." Kumandaya T.V'yê di destê Huseyn de bû û li kanalên televîzyonê digeriya. Bavê wî got:

Bi malbatên Kurd ên li Stenbolê re li ser rewşa wan sohbetek

Avê di ser me re avêtiye



An bostek an çar tilî



Malbatên Kurd li taxên ku li keviyên Stenbolê ne, di şertên pîr dijwar de dijîn.

"Lawo tu çima wiha bi T.V'yê dileyizî, tu li çi digerî?" Huseyn jî got: "Baba vêga filmê Köroğlu heye, di kanala din de jî Kara Murat heye, herdu jî zehf xweş in, ez nizamim kîjan seyr bikim." Me got: "Huseyn di wan filman de çi heye?" Huseyn got: "Wî hûn nizanin gidî, di herdu filman de jî Cüneyt Arkin 'başrol' e. Ê

bi Xwedê wisa delal e." "Çi tê de heye Huseyn?" "Gidî C. Arkin tenê ye, her carê dehe deh neyarên xwe dike, pa hûn nizanin çiqas sîleha wî xweş e? İnce kes nikare wî bîkuje." Huseyn bi vî awayî gotinên xwe didomand û digot: "Ez yek filmê C. Arkin jî 'qaçirmış nakim'. Huseyn di malê de yê mezin e û çar

xwişk û birayên wî yên din jê biçûktir hene.

Piştî ku me çaya xwe vexwar, xaleta xwediyê malê Evdilselam ji bo mêvaniyê ji taxeke dûr ya Stenbolê hate malê. Ku çav bi wênêkêşê (kamerayê) ket, pirsî got: "Lawo hûn kî ne?" Me jî xwe pê da naskirin ku em ji rojnameya Welat in û li ser malbatên Kurd ên li bajarê

Stenbolê dijîn li ser wan lêpirsinekê çêdikin. Xaleta Şerîfe hingê stêrkan di çavên wê de xwe dan der û wiha got: "Lawo avê di ser me re avêtiye, yan bihostek an çar tili." Me ji xaletê pirsî, "Gelo çi ferq di nava Kurdistanê û Stenbolê de heye?" Çavên xaletê dîsa tije hêstir bûn got: "Ma ew jî pirs e lawo, bi Xwedê ez heta saxbim yek xiyareke welat nadim bi temamî Stenbolê. Hûn nizanin ku çiqas raketina li binê darên welatê me xweş e. Di wê kelegema havînê de, di sir û seqema zivistanê de ku em zehf jî diêşandin, lê xweşiya wê derê her tiştî bi mirov dida ji birkirinê. Lê Xwedê ji wan re nehiştan, wê jî, ji me re zehf ditin û piştî vî emrî em mecbûrî koçberiyê kirin." Xaletê hey duayên nexeriyê ji zordan re dikir û digot: "Mirov ku ji yekî re got dijmin gerek e ku çiqas tiştê pîs û çepel heye mirov jê hevî bike. Ji ber ku ew neyarê mirov e, çi bi dest bikeve bernade. Lê İnce ku di nav mirov de xayîn û xwefiroş hebin, ew zor e. Di şûna xayînekî ne diyar de, xwezî deh dijminên diyar hebin çêtir e." Xaletê gelek bi kulbû, lewre ewê du lawên xwe (bi gotina wê du egîd) fîdayî welat kiribû.

Her ku wext derbas dibû, di nava odeyê de cih nemabû ji jin û zarokan. Ji ber ku zîlamên malê cînar dixebitîn tenê pîrek û zarokê wan bi sedema meraqkirinê dihatin li me dinihêrtin û diçûn. Me xwest ku pîrsekê ji jinikeke cînar bikin, ka rewşa wan a metropolê çawa ye. Mensûre (jinika cînar) got: "Keke em hem ji dêrê hem jî, ji mizgeftê bûne, çawa em hatine Stenbolê me zîmanê xwe yê zikmakî hema bêje ji bir kir û em fêrî zîmanê Tirkî jî nebûne. Li Sêrtê genê (qet nebe) me bi zîmanê xwe dizanîbû, her kes jî bî wî zîmanî dipeyivî."

Xwediyê xaniyê mala Evdilselam jî jîk bû. Navê wê Fidan û ji Kurdên Dêrsimê bû. Çawa digot ku ev 20 sal e li bajarê Stenbolê dijî. Sedemê hatina xwe ya Stenbolê bi feqîriyê ve girê dida. Dayîka Fidan, li ser rewşa dawî ya Kurdistanê jî got ku: "Xayînê me pîr in, wexta xayîn ji nav me rabûn hengê welatê me rizgar e. Bi rastî ev 20 sal e ku ez li vî bajarî me, tenê carekî ji polîsan nasnameyê min nepirsîne. Lê beriya bi çendekî em di dolmîşekê de dihatin malê, polîsan rê biribûn û nasnameyan kontrol kirin. Min digot qey diziyek an jî derek hatiye şêlandin, ji ber wê ye. Lê dawî gotin ku li qaçaxê eskeriyê digerin."

Roportaj: Salîh Günbat

welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
- Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tigris
- Navnîşan (Adres) Dräkenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
- Çapkirin (Baskı) Yenî Asya Matbaacılık